# Yazidi Kurmanji: Bible for Mizgînya ku metta nivîsî

Formatted for Translators



generated on Thu Aug 7 16:57:02 2025

©2022 Wycliffe Associates
Released under a Creative Commons Attribution-ShareAlike 4.0 International License.

Bible Text: The English Unlocked Literal Bible (ULB)
©2017 Wycliffe Associates
Available at https://bibleineverylanguage.org/translations
The English Unlocked Literal Bible is based on the unfoldingWord® Literal Text, CC BY-SA 4.0. The original work of the unfoldingWord® Literal Text is available at https://unfoldingword.bible/ult/.
The ULB is licensed under the Creative Commons Attribution-ShareAlike 4.0 International License.

Notes: English ULB Translation Notes
©2017 Wycliffe Associates
Available at https://bibleineverylanguage.org/translations
The English ULB Translation Notes is based on the unfoldingWord translationNotes, under CC BY-SA 4.0. The original unfoldingWord work is available at https://unfoldingword.bible/utn.
The ULB Notes is licensed under the Creative Commons Attribution-ShareAlike 4.0 International License.

To view a copy of the CC BY-SA 4.0 license visit http://creativecommons.org/licenses/by-sa/4.0/

Below is a human-readable summary of (and not a substitute for) the license.
You are free to:

Share — copy and redistribute the material in any medium or format. Adapt — remix, transform, and build upon the material for any purpose, even commercially.

The licensor cannot revoke these freedoms as long as you follow the license terms.
Under the following conditions:

Attribution — You must attribute the work as follows: "Original work available at https://BibleInEveryLanguage.org." Attribution statements in derivative works should not in any way suggest that we endorse you or your use of this work. ShareAlike — If you remix, transform, or build upon the material, you must distribute your contributions under the same license as the original. No additional restrictions — You may not apply legal terms or technological measures that legally restrict others from doing anything the license permits.

Notices:
You do not have to comply with the license for elements of the material in the public domain or where your use is permitted by an applicable exception or limitation.
No warranties are given. The license may not give you all of the permissions necessary for your intended use. For example, other rights such as publicity, privacy, or moral rights may limit how you use the material.


generated on Thu Aug 7 16:57:02 2025

# Mizgînya ku metta nivîsî

1 [1]Ev e þikilê malbeta Îsa Mesîh: lawê Dawid, lawê Îbrahîm: [2]Ji Îbrahîm Îshaq bû, ji Îshaq Aqûb bû, ji Aqûb Cihûda û
birayên wîva bûn, [3]ji Cihûda Pêrês û Zerah bûn, ji Tamarê, ji Pêrês Hesrûn bû, ji Hesrûn Ram bû,[4]ji Ram Amînadav bû,
ji Amînadav Nehþon bû, ji Nehþon Selmon bû, [5]ji Selmon Bowaz bû, ji Rexabê, ji Bowaz Ovêd bû, ji Rût’ê), ji Ovêd Yêþa bû
6û, [6]ji Yêþa Dawid p’adþa bû. Ji Dawid p’adþa Silêman bû, (dya wî waxtekê jina Ûrya bû),[7]ji Silêman Rehobowam bû, ji
Rehobowam Ebîya bû, ji Ebîya Asaf bû, [8]ji Asaf Yêhoþefat bû, ji Yêhoþefat Yoram bû, ji Yoram Ûzya bû,[9]ji Ûzya Yotam bû, ji
Yotam Ahaz bû, ji Ahaz Hizqîya bû, [10]ji Hizqîya Minaþe bû, ji Minaþe Amos bû, ji Amos Yoþîya bû, [11]ji Yoþîya Yexonîya û
biranva bûn. Hingê cimet hêsîr çûne Babîlonê.[12]Lê pey hêsîr-çûyîna Babîlonêr’a, ji Yexonîya Þaltyêl bû, ji Þaltyêl
Zerûbabel bû, [13]ji Zerûbabel Abyûd bû, ji Abyûd Êlyaqîm bû, ji Êlyaqîm Azûr bû, [14]ji Azûr Sadoq bû, ji Sadoq Axîn bû, ji
Axîn Êlyûd bû,[15]ji Êlyûd Êlazar bû, ji Êlazar Metan bû, ji Metan Aqûb bû, [16]ji Aqûb Ûsiv bû, mêrê Meryema ku ji wê Îsa bû,
yê ku Mesîh tê navkirinê. [17]Awa hemû, ji Îbrahîmda heta Dawid, çardeh nisil bûn, ji Dawidda heta hêsîr-çûyîna Babîlonê
çardeh nisil bûn û ji hêsîr-çûyîna Babîlonêda heta Mesîh dîsa çardeh nisil bûn.[18]Jidêbûyîna Îsa Mesîh aha bû: Dya wî,
Meryem Ûsivr’a nîþankirî bû, lê hê dergîstî bû, bi hikumê Ruhê Pîroz duhalî k’ifþ bû. [19]Lê Ûsivê dergîstyê wê, ku merivekî
rast bû, nexwast wê rûreþ ke, fikirî dizîva berde.[20]Gava Ûsiv hê ser vê difikirî, xewnêda milyaketê Xudan wîva k’ifþ bû,
got: «Ûsivê kur’ê Dawid! Netirsî, ku dergîstya xwe Meryemê hildî cem xwe. Zyaroka ku wê jê bibe, ew bi hikumê Ruhê
Pîroz e. [21]Ewê kur’ekî bîne û gerekê navê wî daynî Îsa , çimkî ewê cimeta xwe ji gunehên wan rizgar bike.»[22]Ev her tiþt
aha bû, ku gotina Xudane bi zarê pêxember bê sêrî, ku dibêje: [23]«Va ye, qîza bik’ir wê duhalî derê, kur’ek wê jê bibe û
navê wî wê daynin Îmmanûyêl» , ku tê femkirinê: «Xwedê mer’a ye.»[24]Ûsiv jî, ku ji xewê rabû, weke fermana milyaketê
Xudan kir: dergîstya xwe bire cem xwe. [25]Lê dest nedayê, heta ku kur’ê wêyî nixurî bû. Navê wî danî Îsa.

2

[1]Çaxê li Beytlehima Cihûstanê, rojên p’adþatya Hêrodesda Îsa ji dya xwe bû, hingê ji rohilatê steyrkzan hatine Orþelîmê [2]û
pirsîn: «Ew p’adþayê cihûyane bûyî, k’anê ye? Me steyrka wî li rohilatêda dît û em hatine wî bihebînin.»
[3]Hêrodes p’adþa hema bihîst, t’evîhev bû, t’emamya Orþelîmê jî pêr’a.[4]Hingê wî hemû qanûnzanên cimetê û serokên
k’ahînan civandin û ji wan pirsî: «Mesîh li k’u gerekê bibe?» [5]Wan wîr’a got: «Li Beytlehima Cihûstanê, çimkî bi destê
pêxember aha nivîsar e: [6]„Ay Beytlehim, erdê Cihûda, nava mîrên Cihûdayêda tu ne yekî biç’ûk î, çimkî ji te mîrek wê
rabe, ku þivantyê cimeta min Îsraêlê bike”[7]Hingê Hêrodes dizîva gazî steyrkzanan kir, ji wan pê hesya, ku steyrk çiçax
k’ifþ bûye. [8]Ew þandine Beytlehmê, got: «Her’in bona zyarokêda rast bizanibin. Û çaxê wî bibînin, minr’a bêjin, ku ez jî
bêm, wî bihebînim.»[9]Gava wan ji p’adþê bihîst, çûn. Û ew steyrka ku rohilatêda dîtibûn pêþya wanva çû û ser wê dera ku
zyarok lê bû sekinî. [10]Gava wan ew steyrk dît, gelekî þa bûn,[11]çûne hindur, zyarok Meryema dya wîva t’evayî dîtin, deverû
xwe avîtine ber wî û ew hebandin. Û xeznên xwe vekirin, p’êþkêþên zêr’, bixûr û zimir danê. [12]Paþê wan xewnêda
ferman stand, ku venegerine cem Hêrodes û rêke dinva çûne erdê xwe.[13]Hema steyrkzan ji wir çûn, milyaketê Xudan
xewnêda Ûsivva k’ifþ bû got: «Rabe zyarokê û dya wî hilde bireve Misirê. Li wir bimîne, heta ku ez ter’a bêjim, çimkî
Hêrodesê zyarokê bigere, ku wî bikuje.» [14]Ûsiv jî rabû zyarok û dya wî hildan, þevda çûne Misirê [15]û heta mirina Hêrodes
li wir man. Eva yeka aha bû, ku ew gotina Xudane bi zarê pêxember gotî bê sêrî, ku dibêje: «Ji Misirê min gazî kur’ê xwe
kir.»[16]Çaxê Hêrodes dît, ku ew ji steyrkzanan xapya, gelekî hêrs k’et. Wî ferman da, ku hemû zyarokên kur’îne li
Beytlehmê û der-dorên wê bêne kuþtinê: yên du salî û ji wan biç’ûktir, anegorî wî waxtê ku ji steyrkzanan pê hesya bû.
[17]Hingê ew gotina bi zarê Yêremya pêxember hate sêrî: [18]«Ji Ramayê dengê hêwerzê, þînê, girî û nelîna giran hat. Rahêl
digirya, bona zyarokên xwe û nedixwast sik’in berda bê, çimkî ew îdî t’unebûn.»[19]Çaxê Hêrodes mir, milyaketê Xudan li
Misirê xewnêda Ûsivva k’ifþ bû [20]û gote wî: «Rabe, zyarokê û dya wî hilde her’e erdê Îsraêlê, çimkî ewên pey zyarokê
k’etibûn, ku ew bikuþtana, mirine.»
[21]Ûsiv jî rabû, zyarok û dya wî hildan, vegerya erdê Îsraêlê.[22]Lê gava bihîst, ku Arxêlayo dewsa bavê xwe Hêrodes bûye
p’adþayê Cihûstanê, tirsya her’e wir. Hingê wî xewnêda ferman stand, ku her’ine alyê Celîlê. [23]Ew jî çûne bajarê ku Nisret
digotinê û li wir hêwirîn. Ev aha bû, ku ew gotina bi zarê pêxemberan bê sêrî, ku: «Wîr’a wê bêjin „Yê nisretî”.»

3 [1]Wan rojanda Yûhennayê nixamdar hat, çola Cihûstanêda dannasîn dikir [2]digot: «Ji gunehkirinê vegerin, çimkî
P’adþatya Ezmanan nêzîk bûye.» [3]Ev ew bû, bona k’îjanî Îþaya pêxember gotibû: «Dengê çolêda dike gazî: „Rya Xudan
hazir bikin û þiveryên wî rast bikin”.»[4]K’inca Yûhenna ji pirça devê bû, qayîþeke ç’erm piþtê bû, xwarina wî jî kulî û
hingivê çolê bû. [5]Hingê ji Orþelîmê, ji hemû Cihûstanê û ji her der-dorên ç’emê Ûrdunê dihatine cem wî, [6]gunehên xwe
didane rûyê xwe û bi destê wî ç’emê Ûrdunêda dihatine nixamtinê.[7]Gava Yûhenna dît ku gelek fêrisî û sadûqî jî hatine, ku
bêne nixamtinê, gote wan: «Ç’êjikên me’ran! K’ê wer’a got, ku hûn dikarin ji hêrsa tê birevin? [8]De bi kirinên qenc bidine
k’ifþê, ku hûn ji gunehkirinê vegeryane. [9]Û dilê xweda nefikirin nebêjin: „Îbrahîm bavê me ye”. Ez dibêjime we, Xwedê
dikare ji van keviran jî Îbrahîmr’a lawan derxe.[10]Va ye balt’e ber rawê darê danî ye. Her dara ku berê qenc nade, wê bê
bir’înê û avîtinê nava agir. [11]Ez we bi avê dinixêmim, çawa nîþana dagera ji guneh, lê yekî ji min zortir wê bê. Ez ne hêja
me p’êlavên wî jî bigirime destê xwe. Ewê we bi Ruhê Pîroz û agir binixême. [12]Bêra wîye bêderê dêstda ye. Ewê bêdera
xwe paqij ke, genimê xwe jî bike embarê, lê ka wê bi agirê ku natemire biþewtîne.»[13]Hingê Îsa ji Celîlê hate Ûrdunê, cem
Yûhenna, ku bi destê wî bê nixamtinê. [14]Lê Yûhenna wîr’a razî nedibû û got: «Ez hewcê nixamtina destê te me û tu têyî
cem min?» [15]Îsa lê vegerand got: «Niha bihêle, çimkî li me dik’eve, ku em her rastyê bînine sêrî.» Paþê Yûhenna wîr’a razî


generated on Thu Aug 7 16:57:02 2025

bû.[16]Û hema çawa Îsa hate nixamtinê û ji avê derk’et, ezman vebû û wî dît, wê Ruhê Xwedê mîna kewekê hate xwarê û li
ser wî danî. [17]Û dengekî ji ezmên got: «Ev e, Kur’ê minî delal, ez ji wî razî me.»

## 4

[1]Hingê Ruh Îsa bire çolê, ku ji alyê Þeytanda bê cêribandinê. [2]Wî çil roj û çil þevan rojî girt, peyr’a birçî bû. [3]Cêribandok
nêzîkî wî bû û got: «Heger tu Kur’ê Xwedê yî, de bêje van keviran, ku bibin nan.» [4]Îsa lê vegerand got: «Nivîsar e: „Meriv
t’enê bi nan najî, lê bi her xebera ku ji zarê Xwedê tê xwarê’’.»[5]Hingê Þeytan ew bire Bajarê Pîroz, li ser bilindcya banê
p’aristxanê da sekinandinê [6]û gote wî: «Heger tu Kur’ê Xwedê yî, de xwe bavêje xwarê, çimkî nivîsar e: „Xwedê t’emya te
wê bide milyaketên xwe û ewê te ser destên xwe bigirin, ku nigê te kêvir nek’eve’’.»[7]Îsa lê vegerand: «Aha jî nivîsar
e: „Xudan Xwedê xwe necêribîne’’.»
[8]Þeytan dîsa ew cêriband: bir û rakire ser ç’yakî gelekî bilind û hemû p’adþatyên dinyayê rewþa wanva nîþan kirinê [9]û
gotê: «Ezê van her tiþtan bidime te, heger tu deverû bêyî û min bihebînî.»[10]Hingê Îsa gote wî: «Dûrî min her’e, Þeytan!
Çimkî nivîsar e: „Xudan Xwedê xwe bihebîne û t’enê wîr’a xizmetyê bike’’!» [11]Hingê Þeytan ew hiþt çû û milyaket hatin
Îsar’a xizmetî kirin.[12]Gava Îsa bihîst, ku Yûhenna avîtine hebsê, rabû çû Celîlê. [13]Ew ji Nisretê çû û li Kefernahûma devê
gola Celîlê: li nava sînorê Zebûlonê û Neftelîyêda cî- war bû.[14]Eva yeka aha bû, ku ew gotina bi zarê Îþaya pêxember bê
sêrî: [15]«Erdê Zebûlonê û Neftelîyê, li ser rya berbi golê, wî alyê Ûrdunê, Celîla hêtanosan, [16]ew cimeta ku nav tarîstanyêda
rûniþtibû ronayîke mezin dît û ewên ku li erd û sya mirinêda rûniþtibûn, ronayî wanr’a derk’et.»[17]Ji hingêda Îsa dest bi
dannasînê kir got: «Ji gunehkirinê vegerin, çimkî P’adþatya Ezmanan nêzîk bûye.»[18]Gava Îsa li devê gola Celîlê digerya, wî
du bira dîtin: Þimhûnê ku nav dibû Petrûs û Endrawsê birayê wî. Wan t’or davîte golê, çimkî mesîgir bûn. [19]Îsa gote wan:
«Pey min werin, ezê we bikim nêç’îrvanê merivan.» [20]Wana jî hema ji wê demêda t’orên xwe hiþtin û pey wî çûn.[21]Gava
Îsa ji wir hinekî pêþda çû, du birayên din jî dîtin: Aqûbê Zebedî û Yûhennayê birayê wî. Wan t’evî bavê xwe Zebedî
qeyikêda t’orên xwe hîvês dikirin. Îsa gazî wan jî kir. [22]Wan jî hema ji wê demêda qeyik û bavê xwe hiþtin û pey wî çûn.
[23]Îsa t’emamya Celîlê digerya, kinîþtên wanda hîn dikir û Mizgînya P’adþatyê dannasîn dikir û li nava cimetêda her cûr’e
êþ û nexaþî qenc dikirin. [24]Nav-dengê wî belayî t’emamya Sûryayê bû, cimetê her cûr’e merivên nexaþ anîne cem wî, yên
ku cûr’e-cûr’e êþ û nexaþyanda dinelyan: yên cinak’etî, hîvk’etî, þilûþet û ewî ew hemû jî qenc kirin. [25]Gelek k’omên
merivan jî ji Celîlê, ji qeza Dêkapolîsê, ji Orþelîmê, ji Cihûstanê û ji wî alyê Ûrdunê pey wî diçûn.

## 5

[1]Gava Îsa ew k’om dîtin, rabû ç’yê, rûniþt û þagirtên wî hatine cem. [2]Ewî dest pê kir ew hîn kirin û got: [3]«Xwezî li
ruhfeqîran, çimkî P’adþatya Ezmanan ya wan e. [4]Xwezî li heznyan, çimkî ewê bêne berdilîkirinê.[5]Xwezî li milûkan, çimkî
dinya wê p’ara wan be. [6]Xwezî li wan, yên ku t’î û birçyê rastyê ne, çimkî ewê t’êr bin. [7]Xwezî li dilrehman, çimkî ewê
rehmê bibînin. [8]Xwezî li dilpaqijan, çimkî ewê Xwedê bibînin.[9]Xwezî li wan, k’ê haþtyê dikin, çimkî ewana wê lawên
Xwedê bêne gotinê. [10]Xwezî li wan, yên ku bona rastyê têne zêrandinê, çimkî P’adþatya Ezmanan ya wan e.[11]Xwezî li we,
çaxê bona navê min we bêhurmet kin, bizêrînin û her cûr’e buxdanan li we bikin. [12]Þa bin û bireqisin, çimkî maþê we li
ezmanan gelek e. Bi vî cûr’eyî pêxemberên ku berî we hebûn zêrandin.[13]Hûn xwêya erdê ne, lê heger xwê te’ma xwe
unda ke, îdî bi çi ewê te’mê bistîne? Peyr’a kêrî t’u tiþtî neyê. Wê bê avîtinê û p’êpeskirinê.
[14]Hûn ronaya dinyayê ne. Heger bajarek li ser ç’yê ye, nayê veþartinê.[15]T’u kes ç’irê vênaxe û nake binê derdanê, lê datîne
ser p’êç’irê, ku ronayê bide hemûyên malda. [16]Usa jî bira ronaya we ber merivan ronayî de, ku ew kirinên weye qenc
bibînin û pesinê Bavê weyî ezmanan bidin.[17]Nefikirin, ku ez hatime nivîsarên pêxemberan û Qanûnê xirab bikim. Ez
nehatime xirab bikim, lê ku wan hemûyan bînime sêrî. [18]Ez rast dibêjime we, berî derbazbûna erd û ezmên, niqitkek yan
herfeke biç’ûk ji Qanûnê wê unda nebe, heta ku her tiþt bêne sêrî.[19]Awa k’î ji van t’emyan yeke here biç’ûk bit’eribîne û
merivan usa hîn ke, P’adþatya Ezmananda wê ji hemûyan biç’ûk bê hesabê, lê yê ku wan pêk bîne û hîn bike, P’adþatya
Ezmananda ewê mezin bê hesabê. [20]Lema ez dibêjime we, heger rastya we ser rastya qanûnzan û fêrisyan nek’eve, t’u car
hûn nak’evine P’adþatya Ezmanan.[21]We bihîstye, ku pêþyanr’a hatye gotinê: „Nekuje! K’î ku bikuje, wê bik’eve ber
dîwanê’’. [22]Lê ez wer’a dibêjim, k’î ku badîhewa ser birê xweda hêrs k’eve, ewê bik’eve ber dîwanê. Û k’î bêje birê
xwe: „Bêaqil’’, ewê bik’eve ber dîwana civîna giregiran. Û k’î ku bêje: „Bêhiþ’’, wê bik’eve ber dîwana agirê dojê.[23]Awa
heger tu hedya xwe bînî ser qurbangehê û wir bê bîra te, ku dilê birayê te ji te maye, [24]hedya xwe li wir ber qurbangehê
bihêle û pêþyê her’e birayê xwer’a li hev were û paþê vegere hedya xwe bide.[25]Çaxê, yê k’îna te girtye, te k’aþî cem hakim
dike, rêda zû wîr’a li hev were. Heger na, ewê te bide destê hakim, hakimê jî te bide destê celat û te bavêje hebsê. [26]Ez rast
dibêjime te, tu ji wir dernak’evî heta p’erê xweyî paþin nedî.[27]We bihîstye, ku hatye gotinê: „Zinêk’aryê neke’’. [28]Lê ez
dibêjime we, k’î bi temê xirab k’ulfetekê binihêre, ewî dilê xweda îdî wêr’a zinêk’arî kir.[29]Awa heger ç’evê teyî rastê te ji rê
derdixe, wî derxe û ji xwe bavêje. Ter’a hê qenc e, ku endemeke te unda be, lê t’emamya bedena te nek’eve cenimê. [30]Û
heger destê teyî rastê te ji rê derdixe, wî jêke û wêda bavêje. Ter’a hê qenc e, ku endemeke te unda be, lê t’emamya
bedena te nek’eve cenimê.[31]Ev jî hatye gotinê: „K’î jina xwe berde, bira nivîsara jinberdanê bide wê’’. [32]Lê ez wer’a
dibêjim, k’î jina xwe bêy me’nya qavyê berde, ew dibe me’nya zinêkirina wê û k’î ku yeke mêrberdayî bistîne, ew
zinêk’aryê dike.[33]We ev jî bihîstye, ku pêþyanr’a hatye gotinê: „Derew sond nexwe, li ber Xudan sondê xwe bîne sêrî’’. [34]Lê
ez wer’a dibêjim, qet sond nexwin: ne bi ezmên, çimkî ew k’ursya Xwedê ye, [35]ne bi erdê, çimkî ew bingeha p’yên wî ye,
ne jî bi Orþelîmê, çimkî ew bajarê P’adþayê mezin e[36]û ne jî bi serê xwe sond bixwe, çimkî tu nikarî mûkî sipî kî yan reþ
kî. [37]Lê gotina we bira bibe „belê-belê’’ yan „na-na’’. Ji vê zêdetir ji yê Xirab e.[38]We bihîstye, ku hatye gotinê: „Ç’ev dewsa

ç’ev, diran dewsa diran’’. [39]Lê ez wer’a dibêjim, miqabilî xiraban nesekinin. Heger yek þemaqekê rûyê teyî rastê xe, yê din
jî bide ber.[40]Û heger yek te k’aþî ber dîwanê ke û bixwaze kirasê te ji te bistîne, p’otê xwe jî wîr’a bihêle. [41]Û heger yek zorê
li te bike, ku mîlek rê te bibe, wîr’a dudan her’e. [42]Bide wî, yê ji te dixwaze û berê xwe ji wî neguhêze, yê ku ji te dixwaze
deyn bike.[43]We bihîstye, ku hatye gotinê: „Hevalê xwe hiz bike, dijminê xwer’a xirabyê bixwaze’’. [44]Lê ez wer’a dibêjim,
dijminên xwe hiz bikin û dua-dirozge li wan bikin, yên ku nifiran li we dikin, neyarên xwer’a qencyê bikin û bona wan
dua bikin, yên ku we dizêrînin, [45]ku hûn bibine lawên Bavê xweyî ezmanan. Çimkî ew te’va xwe derdixe, ku him li ser
qencan nedîr dide, him jî li ser xiraban û baranê him bona yên rast dibarîne, him jî bona yên nerast.[46]Heger hûn t’enê
wan hiz bikin, yên ku we hiz dikin, hûnê çi maþ bistînin? Ê ne xercgir jî usa dikin? [47]Û heger hûn t’enê silavê bidine
birayên xwe, îdî hûn çi tiþtî ji ewên din zêdetir dikin? Ê ne xercgir jî usa dikin? [48]Awa k’amil bin, çawa Bavê weyî li
Ezmanan k’amil e.

## 6

[1]Miqatî xwe bin, rehmên xwe li ber merivan nekin, ku wanva bêne dîtinê. Yanê na, hûnê ji Bavê xweyî ezmanan maþ
nestînin.
[2]Awa çaxê tu rehmê dikî, pêþya xwe bor’yê nexe, çawa durû kinîþt û k’ûçanda dikin, ku meriv pesinê wan bidin. Ez rast
dibêjime we, ku wana îdî maþê xwe standye.[3]Lê çaxê tu rehmê dikî, bira destê ç’epê nizanibe, destê rastê çi da, [4]ku
rehmên tu dikî bi dizîva bin. Û Bavê te, ku tiþtên tu dizîva dikî dibîne, wê maþê te aþkere bide te.[5]Çaxê hûn dua dikin,
mîna durûyan nebin. Ew hiz dikin kinîþt û meydananda bisekinin dua bikin, ku merivanva k’ifþ bin. Ez rast dibêjime we,
wan îdî maþê xwe standye. [6]Lê çaxê tu dua dikî, bik’eve oda xwe, pey xwe derî bigire û Bavê xwer’a, ku nayê dîtinê,
duayê xwe bike. Û Bavê te, ku tiþtên tu dizîva dikî dibîne, wê maþê te aþkere bide. [7]Çaxê hûn dua dikin, mîna hêtanosan
zefxeberdar nebin. Wan t’irê bona zef xeberdana wan duayên wanê bêne bihîstinê.[8]Hûn nebine mîna wan, çimkî berî
xwastina we, Bavê we zane çi wer’a lazim e. [9]Lê hûn aha dua bikin: „Bavê meyî ezmanan! Navê te pîroz be, [10]p’adþatya te
bê, daxwaza te be, çawa li ezmên, usa jî ser dinyayê.[11]Nanê meyî rojê roj bi roj bide me. [12]Bibaxþîne me deynên me, çawa
em dibaxþînine deyndarên xwe. [13]Û me nebe ser cêribandinê, lê ji yê xirab rizgar ke, çimkî p’adþatî, qewat û rûmet yên te
ne, heta-ha-tê. Amîn’’.[14]Heger hûn neheqyên merivan bibaxþînine wan, Bavê weyî Ezmanan jî wê bibaxþîne we. [15]Lê
heger hûn neheqyên merivan nebaxþînine wan, Bavê we jî neheqyên we nebaxþîne we.[16]Çaxê hûn rojî digirin, mîna
durûyan medekirî nebin. Ew medê xwe dikin, ku meriv bizanibin ew rojî ne. Ez rast dibêjime we, ku wan maþê xwe
standye. [17]Lê çaxê tu rojî yî, rûyê xwe biþo û serê xwe gulrûn ke, [18]ku meriv nizanibin tu rojî yî, lê t’enê Bavê teyî ku nayê
dîtinê bizanibe. Û Bavê te, ku tiþtên tu dizîva dikî dibîne, wê maþê te aþkere bide.[19]Li ser dinyayê xwer’a xeznê t’op nekin.
Li vê derê zeng û bizûz xirab dikin û diz derevedikin, didizin. [20]Lê xwer’a xeznê li ezmên t’op kin. Li wir zeng û bizûz
xirab nakin û diz jî derevenakin, nadizin. [21]Çimkî xezna te li k’u be, dilê te jî wê li wir be.[22]Ç’ira bedenê ç’ev e. Heger ç’evê
te qenc e, t’emamya bedena teyê ronayî be. [23]Lê heger ç’evê te xirab e, t’emamya bedena teyê tarî be. Awa heger ew
ronaya ku nav teda ye tarî ye, hingê tarya teda wê hê zêde be!
[24]T’u kes nikare du axanr’a xulamtyê bike, çimkî yan wê hîlê wî ji yekî her’e û yê din hiz bike yan jî wê hurmeta yekî
bigire û yê din bêhurmet ke. Hûn nikarin him Xwedêr’a xulamtyê bikin, him jî mamonar’a.[25]Lema ez dibêjime we, bona
jîyîna xwe xeman nekin, ku hûnê çi bixwin û çi vexwin, ne jî bona bedena xwe, ku hûnê çi li xwe kin. Ê ne jîyîn ji
xwarinê zêdetir e û beden jî ji k’incan? [26]Teyredên ezmên binihêrin. Ewana ne diçînin, ne didirûn û ne jî embaranda t’op
dikin, lê Bavê weyî Ezmanan risqê wan dide. Ê ne hûn ji wan zêdetir in?[27]Îdî ji we k’î dikare bi xemkirinê gavekê li ser
bejina xweda zêde ke? [28]Û bona k’incan çima hûn xem dikin? Sosinên çolê binihêrin, çawa þîn dibin, ew ne dixebitin û ne
jî dirêsin. [29]Lê ez wer’a dibêjim, ku Silêman jî nava wê hemû xezna xweye mezinda mîna yeke ji wan xwe nekir.[30]Heger
gîhayê çolê, ku îro heye, sibê davêjine nava êgir, Xwedê usa wan dixemilîne, lê çiqas zêde bona we wê xemxur be,
kêmbawerno? [31]Awa hûn xem nekin û nebêjin: „Emê çi bixwin’’? yan: „Çi vexwin’’? yan jî: „Çi li xwe kin’’?[32]Hêtanos pey
wan her tiþtan dik’evin, lê Bavê weyî ezmanan zane, ku hewcetya we li wan her tiþtanda heye. [33]Lê berê pêþda hûn li
P’adþatya Xwedê bigerin û pey rastya wî her’in û ew her tiþt wê wer’a bêne dayînê. [34]Îdî bona roja sibê xem nekin, çimkî
roja sibê wê bona xwe xem bike. Xemên rojê besî wê ne.

## 7

[1]Dîwanê nekin, ku dîwana we nebe. [2]Hûn çawa dîwanê bikin, ew dîwan jî wê bê serê we û hûn bi çi çapê bipîvin, bi wê jî
bona we wê bê pîvanê.[3]Çima tu zilikê ç’evê birê xweda dibînî, lê k’êranê ç’evê xweda nabînî? [4]Yan jî tu çawa dikarî bêjî
birê xwe: „Bihêle ji ç’evê te zilik derxim’’, lê va ye k’êran ç’evê teda heye? [5]Durû! Berê pêþda ji ç’evê xwe k’êran derxe.
Paþê tuê qenc bibînî, ku ji ç’evê birê xwe zilik çawa derxî.[6]Tiþtên buhurtî nedine sa û ne jî dur’ên xwe bavêjine ber
berazan. Heger na, beraz wê wan p’êpes kin û seyê jî vegerin we gez-gezî kin.[7]Bixwazin û hûnê bistînin, bigerin û hûnê
bibînin, derî xin, ber we wê vebe. [8]Çimkî k’î dixwaze, distîne, k’î digere, dibîne û k’î ku derî dixe, li ber wî vedibe. [9]Ji we k’î
ye ew merivê ku kur’ê wî nan jê bixwaze, ew kevir bidê? [10]Yan jî mesî bixwaze, ew me’r bidê.[11]Hûn ku xirab in, lê zanin
tiþtên qenc bidine lawên xwe, lê çiqas zêde Bavê weyî ezmanan wê tiþtên qenc bide wan, yên ku jê dixwazin. [12]Her çi ku
hûn dixwazin meriv bona we bikin, hûn jî usa bona wan bikin. Ev e meremê Qanûnê û pêxemberan.[13]Derê tengr’a
bik’evine hindur, çimkî fire ye ew derî û ber e ew rya ku dibe berbi undabûnê û yên ku wêda diçin gelek in. [14]Lê gelekî
teng e ew derî û zehmet e ew rya ku dibe berbi jîyînê û yên ku wê rê dibînin hindik in.[15]Hevza xwe ji pêxemberên derew
bikin. Ewê bi p’ostê pêz bêne cem we, lê hindurva gurên t’alank’ar in. [16]Hûnê wan ji berên wan nas bikin. Gelo k’î ji

 generated on Thu Aug 7 16:57:02 2025

stiryan tirî diçine yan ji gongilê, hêjîrê? [17]Dara qenc berê qenc dide, lê dara xirab, berê xirab.[18]Dara qenc nikare berê xirab
bide, ne jî dara xirab dikare berê qenc bide. [19]Her dara ku berê qenc nade, tê bir'înê û avîtinê nava agir. [20]Awa hûnê wan
ji kirinên wan nas bikin.[21]Ne her kesê ku dibêje min: „Xudan! Xudan"! wê bik'eve P'adþatya Ezmanan, lê ew, k'î daxwaza
Bavê minî ezmanan pêk tîne. [22]Wê Rojê gelek wê bêjine min: „Xudan! Xudan! Ê ne me bi navê te pêxembertî kirin, bi navê
te me cin derxistin û bi navê te gelek k'iryamet kirin"? [23]Hingê ezê aþkere bêjime wan: Min hûn qet nas nekirine. Ji min
dûr k'evin, neheqno![24]Awa k'î van gotinên min dibihê û li gora wan dike, ew mîna merivekî serwaxt e, ku mala xwe ser
kevir çê kir. [25]Baran barî, ba û lêyî rabûn, wê malê xistin, lê ew mal hilneþya, çimkî rikinê wê ser kevir bû.[26]Lê k'î ku van
gotinên min dibihê û anegorî wan nake, ew mîna merivekî bêaqil e, ku mala xwe ser qûmê çê kir. [27]Baran barî, ba û lêyî
rabûn, wê malê xistin û ew hilþya, lap wêran bû çû.»[28]Gava Îsa gotinên xwe ser hevda anîn, k'omên civyayî ser hînkirina
wî zendegirtî man, [29]çimkî wî mîna yekî xweyhikum ew hîn dikirin, lê ne mîna qanûnzanên wan.

## 8

[1]Paþê Îsa ji ç'yê dak'et, k'omên giran dane pey wî çûn. [2]Hingê yekî k'otî hat, deverû li ber wî xwe avît û got: «Xudan! Heger
bixwazî, dikarî min paqij kî.»
[3]Îsa destê xwe dirêj kir lê k'et û got: «Ez dixwazim. Paqij be!» Û hema cîda ew ji k'otîbûnê paqij bû.[4]Hingê Îsa gote wî:
«Miqat be, t'u kesîr'a tiþtekî nebêjî, lê her'e xwe nîþanî k'ahîn ke û hedya ku Mûsa t'emî daye, bide, ku hemûyanr'a bibe
þehdetî, ku tu paqij bûyî.»[5]Gava Îsa çû Kefernahûmê, sersedek hate cem, hîvî ji wî kir û got: [6]«Xudan, xulamê min malda
þilûþet p'aldayî k'ûr dinele.» [7]Îsa gotê: «Ezê bêm wî qenc bikim.»[8]Sersed lê vegerand got: «Xudan, ez ne hêja me, ku tu
bêyî mala min. Lê t'enê xeberekê bêje û xulamê minê qenc be. [9]Ez xwexa jî merivekî bin hikumda me û bin destê minda jî
esker hene. Ez yekîr'a dibêjim: „Her'e", diçe, yê dinr'a dibêjim: „Were", tê û xulamê xwer'a dibêjim: „Vî tiþtî bike", dike.»
[10]Gava Îsa ev yek bihîst, zendegirtî ma û ewên ku pey wî diçûn, wanr'a got: «Ez rast dibêjime we, Îsraêlêda jî bawerîke
aha min nedîtye.
[11]Ez wer'a dibêjim, ku ji rohilatê û ji roavayê gelek wê bên û þaya P'adþatya Ezmananda t'evî Îbrahîm, Îshaq û Aqûb
rûnên, [12]lê lawên p'adþatyê wê bêne avîtinê tarya derva. Li wir wê bigirîn û diranan biç'irikînin.»
[13]Paþê Îsa sersedr'a got: «Her'e! Bira anegorî bawerya te ter'a be.» Û wê demê xulamê wî qenc bû.[14]Gava Îsa hate mala
Petrûs, xwesya wî germêda p'aldayî dît. [15]Îsa destê wê girt û germa wê danî, ew jî rabû wanr'a xizmetî kir.[16]Û gava bû berî
êvar, gelek cinak'etî anîne cem wî. Ewî bi xeberê ruhên heram derxistin û hemû nexaþ qenc kirin, [17]ku ew gotina bi zarê
Îþaya pêxember bê sêrî: «Ewî nexaþyên me hildan û êþên me birin.»[18]Gava Îsa k'omên dora xwe dîtin, ferman da
þagirtan, ku her'ine wî berî golê. [19]Hingê qanûnzanek nêzîk bû û gote wî: «Dersdar! Tu k'uda jî her'î, ezê pey te bêm.» [20]Îsa
gotê: «Bona rûvyan k'or hene, teyredên ezmênr'a jî hêlîn, lê bona Kur'ê Meriv cîk t'une, ku serê xwe lê dayne.»[21]Yekî din,
ku ji þagirtên wî bû gotê: «Xudan, destûrê bide min, ku ez her'im pêþda bavê xwe daynime gor'ê.» [22]Lê Îsa gote wî: «Tu
pey min were. Bira mirî miryê xwe bikine gor'ê.»[23]Gava Îsa k'ete qeyikê, þagirtên wî wîr'a çûn. [24]Niþkêva li golê bû firtone,
usa ku qeyik pêlanda unda dibû. Lê ew razayî bû. [25]Hingê þagirt nêzîk bûnê, ew hiþyar kirin û gotinê: «Xudan! Me rizgar
bike! Em unda dibin!»[26]Îsa gote wan: «Çima hûn usa tirsonek in, kêmbawerno?» Wê demê ew rabû li bayê û golê hilat û
her tiþt rihet bû. [27]Merivan þaþmayî got: «Ev çi meriv e, ku ba û gol jî êlimî wî dibin?»[28]Gava Îsa derbazî wî alyê cî-
miskenê Gerdarînê bû, du cinak'etî rastî wî hatin, yên ku ji nav gor'istanê derk'etibûn. Ewana usa har bûn, ku t'u kes
nikaribû wê rêr'a derbaz bûya. [29]Wan kire qîr'în û got: «Tu çi ji me dixwazî, Kur'ê Xwedê? Ji waxt zûtir hatî me bidî
cizaretê?»[30]Ji wan wêdatir kerîkî berazayî mezin diç'êrya. [31]Cinan reca ji wî dikir û digotinê: «Heger tu me derdixî, bihêle
ku em her'in bik'evine nava kerê berazan.» [32]Wî gote wan: «Her'in!» Ew jî derk'etin çûn k'etine nava berazan û t'emamya
kerî revî û ji jorda xwe ji kendêlda avîtine golê û xeniqîn.[33]Berazvan revîn çûne bajêr û çi ku hatibû serê cinak'etyan
gotin. [34]Hingê binelyên bajêr hemû derk'etine pêþya Îsa û gava ew dîtin, reca jê kirin, ku ew ji erdê wan her'e.

## 9

[1]Îsa k'ete qeyikê paþda vegerya hate bajarê xwe. [2]Li wir þilûþetek bi kulavva wergirtî p'aldayî anîne cem. Gava Îsa
bawerya wan dît, gote yê þilûþet: «Lawo, ser xwe be! Gunehên te hatine baxþandinê.»[3]Lê ji qanûnzanan hinek nava
xweda fikirîn: «Ev k'ifirî dike.» [4]Îsa fikirên wan hesya got: «Çima hûn dilê xweda tiþtên xirab difikirin? [5]K'îjan rihet tê
gotinê: „Gunehên te hatine baxþandinê" yan „Rabe û bigere"? [6]Lê ku hûn bizanibin, ku hikumê Kur'ê Meriv heye, ku li
ser dinyayê gunehan afû bike», hingê yê þilûþetr'a got: «Rabe kulavê xwe hilde, her'e mala xwe!»[7]Ew jî rabû çû mala xwe.
[8]Gava merivên hazir ev yek dîtin, tirs k'ete ser wan û þikirî dane Xwedê, ku ev hikum daye mêriv.
[9]Îsa ji wir pêþda çû, yekî navê wî Metta, li cyê xerchildanêda rûniþtî dît, gote wî: «Pey min were.» Ew jî rabû pey Îsa çû.[10]Û
gava Îsa mala Mettada ser sifrê rûniþtîbû, gelek xercgir û gunehk'arên din hatin t'evî Îsa û þagirtên wî rûniþtin.
[11]Fêrisyan, ku ev yek dît, gotine þagirtên wî: «Çima dersdarê we t'evî xercgir û gunehk'aran dixwe û vedixwe?»[12]Lê gava
Îsa ev yek bihîst, gote wan: «Yên silamet ne hewcê hekîm in, lê yên nexaþ. [13]Her'in me'na van xeberan hîn bin: „Ez rehmê
dixwazim, ne ku qurbanê". Ez nehatime, ku gazî yên rast kim, lê: gunehk'aran.»[14]Hingê þagirtên Yûhenna hatine cem wî
û gotin: «Çima em û fêrisî gelek caran rojî digirin, lê þagirtên te rojî nagirin?»
[15]Îsa gote wan: «Qet dibe, ku xandyên dewatê þînê bikin, heta ku zava wanr'a ye? Lê roj wê bên, çaxê zava ji wan bê
hildanê, hingê wê rojî bigirin.[16]T'u kes bi p'arçê nû k'inca kevn p'îne nake, çimkî p'arçê dirûtî wê zorê li k'inca kevn bike û
cyê qeliþî wê hê xirab be.[17]Ne jî þeraba nû dikine meþkên kevn. Çaxê dagirin, hingê meþk wê bit'eqin, þerabê jî birije û
meþk jî wê xirab bin. Lê þeraba nû dikine meþkên nû û her du jî têne xweykirinê.»[18]Îsa hê ev yek wanr'a digot, mîrek hat

xwe avîte ber nigên wî got: «Qîza min hema nûka mir, lê tu were destê xwe dayne ser wê û ewê bijî.»
[19]Îsa rabû þagirtên xweva t’evayî da pey wî çû.[20]K’ulfeteke nexaþ, ku donzdeh sal bûn ew ser xûnê vebibû, piþtêva hat û
serê p’êþa k’inca Îsa k’et. [21]Ewê dilê xweda digot: «Heger ez t’enê k’inca wî k’evim, ezê qenc bim.» [22]Îsa ser milê xweva
vegerya, ew dît, gotê: «Evdê! Ser xwe be! Bawerya te tu qenc kirî.» Û wê demê ew k’ulfet qenc bû.[23]Gava Îsa gihîþte mala
mîr, nihêrî, wê xelq t’evîhev bûye û bilûrvan jî bi zelûlî bilûrê dixin, [24]gote wan: «Derk’evin! Qîzik nemirye, lê hênijîye.»
Wana qerfê xwe wî dikirin.[25]Lê gava cimet derxistine derva, Îsa çû hindur, destê wê girt û qîzik rabû ser p’yan. [26]Ev deng-
bes belayî t’emamya wî erdî bû.[27]Gava Îsa ji wir derk’et çû, du merivên kor pey wî k’etin, kirine qîr’în û gotin: «Me were
rehmê! Kur’ê Dawid!»
[28]Gava gihîþtine malê, her du kor hatine cem. Îsa pirs da wan: «Hûn bawer dikin, ku dikarim alî we bikim?» Wan lê
vegerand: «Belê Xudan.»[29]Hingê Îsa destê xwe da ç’evên wan û got: «Anegorî bawerya we wer’a be.» [30]Wê demê ç’evên
wan vebûn. Îsa sert t’emî da wan û got: «Miqat bin, bira t’u kes vê yekê nizanibe.» [31]Lê ewana derk’etin, li t’emamya wî
erdî nav û dengê wî bela kirin.[32]Gava yên qencbûyî derk’etin çûn, hinekan cinak’etîkî lal anî cem Îsa. [33]Gava ewî cin
derxist, yê lal xeber da. K’omên merivan zendegirtî man û gotin: «Li Îsraêlêda jî tiþtekî aha qet nebûye.» [34]Lê fêrisyan
digot: «Ew cinan bi hikumê mîrê cinan derdixe.»[35]Îsa her gund û bajaran digerya, kinîþtên wanda hîn dikir: Mizgînya
p’adþatyê dannasîn dikir û li nav cimetêda her cûr’e nexaþî qenc dikirin. [36]Gava ewî k’omên merivan dît, dilê wî li ser
wan þewtî, çimkî ew mîna pezên bêy þivan: berdayî û belabûyî bûn.[37]Hingê ewî þagirtên xwer’a got: «Nandirûn gelek e,
lê k’arker hindik in. [38]Awa hîvî ji xweyê dirûnê bikin, ku k’arkeran nandirûna xwer’a biþîne.»

# 10

[1]Îsa her donzdeh þagirt gazî cem xwe kirin û hikum da wan, ku ruhên heram derxin, hemû êþ û nexaþyan jî qenc bikin.
[2]Navê her donzdeh þandyan ev in: Yê pêþin Þimhûn, ku Petrûs hate navkirinê û birê wî Endraws, Aqûbê Zebedî, birê wî
Yûhenna, [3]Fîlîpo, Bertolomeyo, Tûma, Mettayê xercgir, Aqûbê Halfawo û Tadayo , [4]Þimhûnê Kenanî û Cihûdayê Îsxeryotî,
yê ku nemamya Îsa kir.[5]Îsa ev her donzdeh þandin, t’emî da wan got: «Neçine nava hêtanosan û nek’evine bajarên
Sameryayê. [6]Lê berê pêþda her’ine nava pezên mala Îsraêlêye undabûyî. [7]Çaxê hûn her’in, dannasîn kin bêjin: „P’adþatya
Ezmanan nêzîk bûye”.[8]Nexaþan qenc kin, k’otyan paqij kin, miryan zêndî kin, cinan derxin. We bêy maþ standye, bêy
maþ jî bidin. [9]Piþteka xweda t’u tiþtî hilnedin: ne zêr’, ne zîv, ne sifir, [10]ne tûrik bona rê, ne du dest kiras, ne p’êlav, ne jî
kewaz, çimkî k’arker hêjayî maþê xwe ye.[11]Çi bajar yan gundê hûn her’inê, maleke hêja bibînin û li wir bimînin, heta ku
hûn ji wir diçin. [12]Çaxê hûn bik’evine malê, silavê bidin û bêjin: „Haþtî li vê malê”. [13]Û heger ew mal hêja ye, bira silava
we li ser wê be, lê heger ne hêja ye, bira silava we li we vegere.[14]Lê k’î we hilnede malê û guhdarya xeberên we neke, çaxê
hûn ji wê malê yan ji wî bajarî derdik’evin, t’oza nigên xwe dawþînin. [15]Ez rast dibêjime we, Roja axretê halê cimeta
Sodom û Gomorayê wê ji ya wî bajarî çêtir be.[16]Awa ez we çawa pez diþînim nava guran. Îdî mîna me’ran serwaxt bin û
mîna kewan dilsafî. [17]Hevza xwe ji merivan bikin, ewê we bibine ber dîwan û kinîþtên xwe, wê we bidine ber qamçyan.
[18]Bona min wê we bibine ber hizûra welî û p’adþan, ku hûn ber wan û hêtanosan þehdetyê bidin.[19]Lê çaxê we bibine ber
dîwanan, xem nekin, ku hûnê çawa yan çi bêjin. Çi hûnê bêjin, hingê wê wer’a bê dayînê. [20]Çimkî ne ku hûnê xeber din, lê
Ruhê Bavê weyî ku nava weda ye.[21]Bira wê birayê xwe bide kuþtinê, bavê jî, kur’ê xwe û law jî wê rabine ber dê û bavên
xwe û wan bidine kuþtinê. [22]Bona navê min hûnê ber ç’evên hemûyan reþ bin. Lê k’î ku heta xilazyê sebir bike ewê rizgar
be. [23]Û çaxê nava vî bajarîda we bizêrînin, birevine bajarekî din. Ez rast dibêjime we, heta hatina Kur’ê Meriv, hûnê pêr’a
negihînin hemû bajarên Îsraêlê bigerin.[24]Þagirt ji dersdarê xwe ne mestir e û ne jî xulam ji axayê xwe. [25]Besî þagirt e, ku
mîna dersdarê xwe be û xulam jî mîna axayê xwe. Heger malxê malêr’a „Belzebûl” gotin, lê gelo neferên mala wîr’a wê
hê zêde nebêjin?[26]Awa îdî ji merivan qet netirsin. Ne tiþtekî dizîva heye, ku aþkere nebe û ne jî tiþtekî veþartî, ku
derneyê. [27]Çi ez wer’a taryêda dibêjim, hûn wê nava ronayêda bêjin û çi ku hûn guhanda dibihên, ser banan bikine dengî.
[28]Û ji wan netirsin yên ku bedenê dikujin, lê nikarin ruh bikujin. Lê hûn ji wî bitirsin, yê dikare ruh û bedenê dojêda unda
ke. [29]Ê ne du ç’ivîk bi diravekî çarqurûþê têne firotanê? Lê ji wan yek jî bêy destûra Bavê we nak’eve erdê. [30]Belê, her
t’êlekî p’or’ê serê we jimartî ye. [31]Îdî netirsin. Hûn ji gelek ç’ivîkan zêdetir in.[32]K’ê ku min ber merivan îqrar bike, ezê jî wî
ber Bavê xweyî ezmanan îqrar bikim. [33]Lê k’ê ku min ber merivan înk’ar bike, ezê jî wî ber Bavê xweyî ezmanan înk’ar
bikim.[34]Nefikirin, ku ez hatime haþtyê bînime dinyayê. Ez nehatim haþtyê bînim, lê þûr. [35]Çimkî ez hatime ku kur’ ji bavê,
qîzê ji dê û bûkê ji xwesyê cude bikim [36]û dijminên mêriv wê ji mala wî bin.[37]K’ê bavê xwe yan dya xwe ji min zêdetir hiz
bike, ew ne hêjayî min e. K’ê kur’ê xwe yan qîza xwe ji min zêdetir hiz bike, ew ne hêjayî min e. [38]K’ê xaçê xwe hilnede
pey min neyê, ew ne hêjayî min e. [39]K’ê kesa xwe xwey dike, wê unda bike, lê k’ê kesa xwe bona min unda bike, ewê wê
bibîne.[40]Yê we qebûl dike, ew min qebûl dike û ewê min qebûl dike, ew yê ez þandime qebûl dike. [41]Ewê ku pêxember
qebûl dike çawa pêxember, wê maþê pêxember bistîne û ewê ku merivekî rast qebûl dike çawa yekî rast, ewê maþê yê
rast bistîne.[42]Û yê ku hema t’ase ava sar jî dide van biç’ûkan yekî, bona xatirê wê yekê ku ew þagirtê min e, ez rast
dibêjime we, ewê maþê xwe t’u car unda neke.»

# 11

[1]Gava Îsa t’emyên ku dane her donzdeh þagirtên xwe xilaz kirin, ji wir çû nava bajarên wan, ku hîn bike û dannasîn bike.

[2]Çaxê Yûhenna hebsêda bona k’arên Mesîh bihîst, du þagirtên xwe þandine cem wî [3]û jê pirsîn: «Tu ew î, ku gerekê bihata
yan em hîvya yekî din bin?»[4]Îsa caba wan da û got: «Her’in, çi ku hûn dibînin û dibihên bêjine Yûhenna. [5]Kor dibînin,

seqet digerin, k’otî paqij dibin, ker’ dibihên, mirî zêndî dibin û feqîranr’a jî Mizgînî tê dayînê. [6]Û xwezî li wî, k’î ku minda
nak’eve þikê.»[7]Gava ew çûn, Îsa bona Yûhenna dest pê kir k’omên hazirr’a got: «Hûn derk’etin çolê çi binihêrin? Qamîþekî
ji bayê diheje? [8]Lê hûn derk’etin çi binihêrin? Merivekî k’incên nazik xwe kirî? Ê ne yên ku k’incên nazik xwe dikin,
rewþxanên p’adþanda ne?[9]Lê derk’etin çi binihêrin? Pêxemberekî? Belê, ez dibêjime we, ji pêxemberekî jî zêdetir. [10]Ev ew
e, bona k’ê nivîsar e: „Va ye, ezê qasidê xwe pêþya teva biþînim. Ewê pêþya teva rya te hazir bike”.[11]Ez rast dibêjime we, ji
nava ewên ji k’ulfetan bûne, t’u kes ji Yûhennayê nixamdar mestir nebûye. Lê P’adþatya Ezmênda yê herî biç’ûk ji wî
mestir e. [12]Ji rojên Yûhennayê nixamdarda heta niha P’adþatya ezmana bi qewat tê zeftkirinê û yên baweryêda qewat
dest davêjine wê.[13]Çimkî hemû pêxemberan û Qanûnê heta Yûhenna bona P’adþatya ezmana þehdetî dan. [14]Û heger hûn
dixwazin, vê gotinê hildin, ew Êlyas e, ku wê bihata. [15]Guhê k’êyî bihîstinê heye bira bibihê.[16]Niha ez vî nisilî bi çi bidime
ber hev? Ew mîna wan zyarokan e, yên ku bazaranda rûniþtî, gazî hevalên xwe dikin [17]dibêjin: „Me bona we zurnê xist,
hûn nereqisîn û bona we beyt got, we þîn nekir”.[18]Yûhenna hat, ne dixwar, ne vedixwar, digotin: „Cin wîda heye”. [19]Kur’ê
Meriv hat, dixwe û vedixwe, bona wî dibêjin: „Ew yekî pey xwarin û vexwarinê k’etî ye, hevalê xercgir û gunehk’aran e”.
Lê serwaxtyê bi lawên xwe da k’ifþê, ku ew rast e.»[20]Hingê Îsa dest pê kir, wan bajaran hilat, k’îjananda gelek k’iryametên
wî hatibûne kirinê, çimkî ew ji gunehkirinê venegeryan. [21]«Wey li te Xorazîn! Wey li te Beytsayda! Heger ew k’iryametên
ku nava weda bûn, Sûr û Saydêda bibûna, ewana wê zûva bi k’urx û k’ozyê ji xirabyê vegeryana. [22]Lê ez wer’a dibêjim,
Roja Axretê halê Sûrê û Saydê wê ji halê we hêsatir be.[23]Û tu Kefernahûm, te t’irê tuê heta ezman bilind bî? Na! Tuê heta
dojê her’î xwarê! Ew k’iryametên ku nav teda bûn, heger Sodomêda bibûna, ewê heta roja îroyîn bima. [24]Lê ez wer’a
dibêjim, Roja Axretê halê cimeta erdê Sodomê wê ji halê te çêtir be.»[25]Hingê Îsa got: «Þikir navê te be Bavo, Xudanê erd û
ezman, ku ev tiþt te ji serwaxt û zanan veþartin û li ber zyarokan vekirin. [26]Belê Bavo, çimkî aha li te xaþ hat.
[27]Her tiþt ji Bavê min minr’a hatye dayînê. T’u kes Kur’ nas nake pêþtirî Bavê û t’u kes Bavê nas nake pêþtirî Kur’ û ew wê
nas bikin, k’îjananr’a Kur’ bixwaze Bavê bide naskirinê.[28]Werine cem min, hemûyên westyayî û bargiran û ezê rihetyê
bidime we. [29]Nîrê k’arê min hildine ser xwe û ji min hîn bin, ku milûk im û dilda nek’ubar û hûnê rihetyê ruhê xwer’a
bibînin. [30]Çimkî nîrê min þîrin e, barê min sivik.»

## 12

[1]Hingê Îsa rojeke þemyê nava zevyanr’a derbaz dibû, þagirtên wî birçî bûn û dest pê kirin simbilên genim çinîn û xwarin.
[2]Gava fêrisyan ev yek dît, gotine wî: «Hela binihêre, þagirtên te roja þemyê tiþtê necayîz dikin.»[3]Îsa gote wan: «We
nexandye, ku Dawid çi kir, gava ew û yên pêr’a birçî bûn? [4]Ew çû Xana Xwedê û nanê Xwedêr’a dayî xwar, lê ew nan ne
wîr’a cayîz bû, ku bixwara, ne jî wanr’a, yên ku t’evî wî bûn, lê t’enê k’ahînanr’a.[5]Yan jî we Qanûnêda nexandye, ku roja
þemyê k’ahîn p’aristxanêda þemyê diherimînin û dîsa bêsûc in? [6]Lê ez wer’a dibêjim, ku li vir yekî ji p’aristxanê mestir
heye.[7]Heger we bizanibûya fikira vê xeberê çye, ku tê gotinê: „Ez rehmê dixwazim, ne ku qurbanê”, hingê weyê yên
bêsûc gunehk’ar nekirana. [8]Çimkî Kur’ê Meriv Xudanê roja þemyê ye jî.»[9]Îsa ji wir rabû çû û hate kiniþta wan. [10]Merivek li
wir hebû, ku destê wî k’iþyabû. Hinekên ku dixwastin xeyba Îsa bikirana ji wî pirsîn: «Gelo cayîz e, ku roja þemyê
nexaþan qenc bikin?»[11]Wî jî gote wan: «Ji we k’î ye, ku pezeke wî hebe û roja þemyê bik’eve k’orê, wê negire û dernexe?
[12]Lê meriv çiqas ji pêz zêdetir e! Awa roja þemyê qencîkirin cayîz e.»[13]Hingê Îsa gote wî merivî: «Destê xwe dirêj ke.» Ewî
jî dirêj kir û mîna destê din qenc bû. [14]Lê fêrisî derk’etine derva, bona Îsa li hev þêwrîn, ku çawa wî bidine kuþtinê.[15]Çaxê
Îsa wê yekê hesya, ji wir çû, gelek k’omên merivan pey wî çûn. Ewî hemû jî qenc kirin [16]û t’emî da wan, ku bona wî nekine
dengî, [17]ku ew gotina bi zarê Îþaya pêxember bê sêrî:[18]«Va ye xulamê min, ku min ew hilbijartye û hizkiryê min, ku min
ew begem kirye. Ezê Ruhê xwe daynime ser wî û ewê miletanr’a heqyê bike dengî.[19]Ewê ne bik’eve hucetê, ne bike
qar’eqar’ û ne jî yekê dengê wî meydananda bibihê. [20]Ew qamîþê hincirî hûr nake, p’ilta diç’irûse vênasîne, heta ku heqyê
bigihîne sêrî. [21]Û her milet wê gumana xwe bidine ser navê wî.»[22]Hingê cinak’etîkî kor û lal anîne cem Îsa û ewî ew qenc
kir, usa ku wî him dît, him jî xeber da. [23]Û k’omên hazir hemû zendegirtî man û gotin: «Gelo ev e kur’ê Dawid?»[24]Lê gava
fêrisyan bihîst, gotin: «Eva cinan bi hikumê Belzebûlê mîrê cinan derdixe.» [25]Lê Îsa fikirên wan hesya gote wan: «Her
p’adþatya ku nava wêda bêt’ifaqî hebe, wê wêran be û her bajar yan mala ku nava wêda bêt’ifaqî hebe, ew namîne.
[26]Heger Þeytan xwexa xwe derdixe, usa dertê, ku nava p’adþatya wîda bêt’ifaqî heye, îdî p’adþatya wî wê çawa bimîne?
[27]Heger ez bi hikumê Belzebûl cinan derdixim, lê peyçûyên we bi çi derdixin? Lema ewê bibine hakimên we.[28]Lê heger ez
bi hikumê Ruhê Xwedê cinan derdixim, îdî P’adþatya Xwedê gihîþtye heta we. [29]Yan çawa yek dikare bik’eve mala yekî
qewat û hebûka wî t’alan ke, heger berê pêþda ewî qewat girênede? Çaxê girêde, hingê wê bikaribe mala wî t’alan ke.
[30]K’î ku ne t’evî min e, miqabilî min e û k’î ku t’evî min t’op nake, ew bela dike.[31]Lema ez wer’a dibêjim, her guneh û k’ifirî
wê li merivan bêne baxþandinê, lê ewê ku k’ifiryan Ruh bike, li wî nayê baxþandinê. [32]K’î tiþtekî miqabilî Kur’ê Meriv
bêje, wê li wî bê baxþandinê, lê heger yek hindava Ruhê Pîrozda bêje, li wî nayê baxþandinê, ne li vê dinyayê, ne jî dinê
axretêda.[33]Heger dar qenc e, berê wê jî qenc e, heger dar xirab e, berê wê jî xirab e, çimkî dar ji berê xwe tê naskirinê.
[34]Ç’êjikên me’ran! Çawa hûn dikarin qenc xeber din, heger hûn xirab in? Çimkî çi ku dilda heye zar jî wê dibêje. [35]Merivê
qenc ji xezna xweye qenc qencyê derdixe, lê merivê xirab ji xezna xweye xirab xirabyê derdixe.[36]Ez wer’a dibêjim, Roja
Axretê meriv bona her xebereke p’ûç, ku xeber didin, wê cabdar bin. [37]Çimkî hûnê bi xeberên xwe bêsûc derên û bi
xeberên xwe gunehk’ar derên.»[38]Hingê ji qanûnzan û fêrisyan hinekan wîr’a got: «Dersdar! Em dixwazin ji destê te
nîþanekê bibînin.» [39]Ewî li wan vegerand got: «Nisilê xirab û xalifî nîþanekê dixwaze, lê wîr’a nîþaneke din nayê dayînê,
pêþtirî nîþana Ûnis pêxember. [40]Çawa ku Ûnis sê roj û sê þevan zikê hûtda ma, Kur’ê Meriv jî wê usa sê roj û sê þevan dilê
erdêda bimîne.[41]Merivên Nînewê wê Roja Axretê rabin û dîwana vî nisilî bikin, çimkî ewana bi dannasîna Ûnis ji

gunehkirinê vegeryan û va ye yekî ji Ûnis mestir li vir heye.[42]Xanimp'adþa Baþûrê Roja Axretê wê rabe û vî nisilî neheq
bike, çimkî ew ji serê dinyayê hat, ku serwaxtya Silêman bibihê û va ye yekî ji Silêman mestir li vir heye.[43]Çaxê ruhê
heram ji mêriv dertê, li cyê bêy av digere, ku rihetyê bibîne. Lê gava nabîne, [44]hingê dibêje: „Ez vegerime mala xwe, ji k'u
derk'etime”. Çaxê tê, dibîne mal vala, paqijkirî û hevdayî ye. [45]Hingê diçe heft cinên mayîne ji xwe xirabtir jî tîne,
dik'evine wir dimînin. Û axirya wî merivî ji pêþyê xirabtir dibe. Usa jî wê bê serê vî nisilê xirab.»[46]Hê wî k'omên hazirr'a
xeber dida, dê û birayên wî derva sekinîn, dixwastin wîr'a xeber bidin. [47]Yekî gote wî: «Dya te û birayên te derva sekinî ne
û dixwazin ter'a xeber din.»[48]Ewî jî li wî vegerand got: «K'î ye dya min û k'î ne birayên min?» [49]Hingê bi destê xwe
þagirtên xwe nîþan dan û got: «Awa, dê û birayên min! [50]Çimkî k'î ku daxwaza Bavê minî ezmana bîne sêrî, ew e birayê
min, xûþka min û dya min.»

# 13

[1]Wê rojê Îsa ji malê derk'et, li devê golê rûniþt. [2]Û haqas k'oma giran hate cem wî, ku ew k'erba k'ete qeyikê rûniþt û
t'emamya k'omê devê golê sekinî.[3]Ewî gelek tiþt bi meselan ew hîn kirin û got: [4]«T'oximreþ rabû çû, ku t'oxim biçîne. Gava
wî direþand, ji wan hinek k'etine devê rê, teyrede hatin û ew xwarin. [5]Hinekên din k'etine ser cyê kevirî, li k'u xwelî kêm
bû. Ew zû þîn bûn, çimkî xwelî ne k'ûr bû. [6]Lê gava te'v derk'et, ew qimilîn û çimkî rawên wan t'unebûn, hiþk bûn.
[7]Hinekên din k'etine nava stiryan, stirî rabûn û ew xeniqandin. [8]Lê hinekên din jî k'etine nava erdê qenc û ber dan, yê sed
bare, yê þêst û yê jî sî. [9]Guhê k'êyî bihîstinê heye bira bibihê!»[10]Hingê þagirtên wî nêzîk bûnê û gotinê: «Çima bi meselan
wanr'a xeber didî?» [11]Wî li wan vegerand got: «Wer'a hatye dayînê, ku sur'ên P'adþatya ezmana hûn bizanibin, lê wanr'a
nehatye dayînê. [12]Çimkî ya k'ê ku heye, wê wîr'a hê bê dayînê û zêde be û ya k'ê ku t'une, çi heye jî wê jê bê standinê.[13]Ez
bona wê bi meselan wanr'a xeber didim, ku ew dinihêrin û nabînin, dibihên, lê guhê xwe nadinê û fem nakin. [14]Ser wan
pêxembertya Îþaya tê sêrî, ku dibêje: „Hûnê bi guhan bibihên, lê fem nekin, bi ç'evan binihêrin, lê nebînin.[15]Çimkî eva
cimeta serhiþk e, bi guhan giran dibihên û ç'evên xwe girtine, ku bi ç'evan nebînin, bi guhan nebihên û bi hiþ fem nekin,
venegerin, ku ez wan qenc bikim”.[16]Lê xwezî ç'evên we, ku dibînin û guhên we, ku dibihên. [17]Ez rast dibêjime we, gelek
pêxember û merivên rast hizreta dîtina van tiþtan bûn, çi ku hûn dibînin, lê nedîtin û ew tiþt bibihîstana, çi ku hûn
dibihên, lê nebihîstin.[18]Niha hûn þirovekirina mesela t'oximreþ bibihên. [19]Her merivê ku xebera p'adþatyê dibihê û fem
nake, yê Xirab tê û ji dilê wî xebera çandî direvîne. Evana ew in, ku dilda mîna xwelya devê rê ne, ku lê hate çandinê.
[20]20Merivên mîna cyê kevirî, ku lê hate çandinê, ew in, ku çaxê xeberê dibihên, zû bi dilê þa hildidin. [21]Lê ku rawê xeberê
nava wanda t'une, dirêj t'ab nakin. Çaxê bona xeberê rastî tengasyan yan zêrandinê tên, zû ji rê dik'evin.[22]Yên mîna erdê
stirî jî, ku lê hate çandinê, ew in, ku xeberê dibihên, lê xemên vê dinyayê û xapandina dewlemendtyê xeberê dixeniqînin
û ew bêy ber dimînin. [23]Lê merivên mîna erdê qenc, ku lê hate çandinê ew in, ku xeberê dibihên, fem dikin û ber didin, yê
sed bare, yê þêst û yê jî sî.»[24]Îsa meseleke din jî wanr'a got: «P'adþatya ezmana mîna vê yekê ye: Merivekî nava erdê
xweda t'oximê qenc çand. [25]Çaxê meriv razayî bûn, dijminê wî hat û li nav genimda zîwan jî çand û çû. [26]Çaxê genim
gihîþt berê xwe da, hingê zîwan jî pêr'a k'ifþ bûn.[27]Xulamên xweyê erdê nêzîkî wî bûn û gotinê: „Axayê me! Te nava erdê
xweda t'oximê qenc neçand? Lê ev zîwan ji k'u hatin”? [28]Ewî li wan vegerand got: „Dijminekî ev tiþt kirye”. Xulaman jî
gotinê: „Niha tu dixwazî, ku em her'in wan derxin”?[29]Ewî got: „Na, nebe gava hûn zîwanê derxin, genim jî pêr'a derê.
[30]Bihêlin bira her du jî hevr'a bigihîjin heta roja nandirûnê. Roja nandirûnê ezê k'arkeranr'a bêjim, berê pêþda zîwanê
bidirûn, gurz-gurz girêdin bona þewatê, lê gênim bikine embara min”.»[31]Meseleke din jî wanr'a got: «P'adþatya ezmana
mîna vê yekê ye: Merivekî libeke t'oximê xerdalê hilda, erdê xweda çand. [32]Ew ji hemû t'oximan hûrtir e, lê çaxê digihîje,
ji hemû p'incaran mestir dibe û dibe dar, usa ku teyredên ezmên tên hêlînên xwe ser çiqilên wê çê dikin.»[33]Îsa meselek jî
gote wan: «P'adþatya ezmana mîna hevîrtirþk e, ku k'ulfetekê hilda nava sê kod arda stira, heta ku hemû hilat.»[34]Îsa ev
her tiþt bi meselan k'oma merivanr'a gotin û bêy mesele t'u tiþt wanr'a nedigot, [35]ku ew gotina bi zarê pêxember bê sêrî:
«Ezê bi meselan wanr'a xeber dim û tiþtên ji dema efirandina dinyayêda veþartî bêjim.»[36]Hingê Îsa ew k'om hiþt, hate
malê. Þagirtên wî hatine cem û gotinê: «Mesela gênim û zîwanê mer'a þiroveke.» [37]Ewî li wan vegerand got: «Ewê ku
t'oximê qenc çand, Kur'ê Meriv e. [38]Erd dinya ye, t'oximê qenc lawên p'adþatyê ne, lê zîwan lawên yê Xirab in. [39]Dijminê
ku ew çandin, Þeytan e. Nandirûn axirya dinyayê ye, k'arker jî milyaket in.[40]Û çawa zîwanê t'op dikin diþewtînin, axirya
vê dinyayê jî wê usa be. [41]Kur'ê Meriv wê milyaketên xwe biþîne û ewê ji p'adþatya wî hemûyên ku merivan ji rê derdixin
û neheqyê dikin t'op kin [42]û bavêjine firna agir. Li wir wê bibe girî û ç'irke-ç'irka diranan. [43]Hingê merivên rast wê
P'adþatya Bavê xweda mîna te'vê þewq bidin. Guhê k'êyî bihîstinê heye bira bibihê![44]P'adþatya ezmana mîna vê yekê ye:
Erdekîda xezneke veþartî hebû. Merivek wê dibîne, dîsa vediþêre, ji þabûna diçe hemû hebûka xwe difiroþe û wî erdî
dik'ir'e. [45]Dîsa P'adþatya ezmana mîna vê yekê ye: Merivekî bazirgan dur'ên rind digere. [46]Çaxê dur'ekî qîmetgiran dibîne,
diçe hemû hebûka xwe difiroþe û wî dur'î dik'ir'e.[47]Dîsa P'adþatya ezmana mîna vê yekê ye: T'orek tê avîtinê be'rê û her
cûr'e mesî dik'evinê. [48]Çaxê t'or t'ije dibe, dik'iþînine der, rûdinên mesyên baþ t'op dikine nava derdanan, lê yên bêkêr
wêda davêjin.[49]Axirya dinyayê jî wê usa be. Milyaket wê derk'evin xiraban ji nava qencan cude kin [50]û bavêjine firna agir.
Li wir wê bibe girî û ç'irke-ç'irka diranan.»[51]Îsa pirs da wan: «We ev her tiþt fem kirin?» Wana jî gote wî: «Belê Xudan.»
[52]Ewî jî gote wan: «Bona vê yekê her qanûnzanekî, ku li ser P'adþatya ezmana hîn bûye, mîna merivekî xweymilk' e, ku ji
xezna xwe tiþtên kevn û nû derdixe.» [53]Gava Îsa ev mesele xilaz kirin, ji wir çû[54]û hate cî-miskenê xwe û kinîþta wanda
ew hîn dikirin. Ewana jî zendegirtî diman û digotin: «Ev serwaxtî û qewata k'iryametan ji k'u gihîþtinê? [55]Ê ne ev kur'ê
necar e? Ê ne navê dya wî Meryem e? Ê ne birayên wî Aqûb, Ûsiv, Þimhûn, Cihûda û [56]her xûþkên wî cem me ne? Ev her

tiþt ji k’u gihîþtine wî?»57Aha ewana ji wî k’ûvî bûn, lê Îsa gote wan: «Pêxember t’u deran ne bêhurmet e, lê t’enê mal û cî-
miskenê xweda.» 58Ewî li wê derê gelek k’iryamet nekirin, çimkî bawerya wan t’unebû.

## 14

1Hingê Hêrodesê çaran bona Îsa bihîst, 2xulamên xwer’a got: «Eva Yûhennayê nixamdar e, ji nava miryan zêndî bûye.
Lema jî bi destê wî k’iryamet têne kirinê.»3Hêrodes xwexa Yûhenna girtibû bend kiribû avîtibû hebsê, rûyê Hêrodya jina
Fîlîpoyê birê xweda. 4Çimkî Yûhenna Hêrodesr’a gotibû: «Ne rast e, tu wê bistînî.» 5Lema Hêrodes dixwast ew bikuþta, lê
ji cimetê ditirsya, çimkî cimetê Yûhenna çawa pêxember qebûl dikir.6Çaxê roja jidêbûyîna Hêrodes hat, þayêda qîza
Hêrodyayê li ber wan reqisî û gelekî li Hêrodes xaþ hat. 7Wî sond xwar gote qîzikê, ku ew çi bixwaze wê bide wê.8Qîzikê jî,
ku ji dê hatibû þîretkirinê, got: «K’a li vir, li ser sinyê, serê Yûhennayê nixamdar bide min.» 9P’adþa ber xwe k’et, lê çimkî
li ber t’eglîfkiryan sond xwaribû, ferman da, ku xwastina wê bê dayînê.10Ewî þand, hebsêda serê Yûhenna da lêxistinê 11û
serê wî li ser sinyê anîn dane qîzikê. Qîzikê jî dya xwer’a bir. 12Hingê þagirtên wî hatin cinyazê wî hildan û ew kirine
gor’ê. Paþê çûn Îsar’a gotin.13Gava Îsa ev yek bihîst, ji wir bi qeyikê çû cîkî xewle. Lê k’oma merivan gava bihîst, ji bajaran
pey wî p’ya çûn. 14Gava Îsa ji qeyikê derk’et û k’omeke giran dît, hingê dilê wî li ser wan þewtî û nexaþên wan qenc kirin.
15Berî êvarê þagirtên wî hatine cem û gotinê: «Ev der cîkî xikî-xwelî ye û îdî dereng e. Îzina k’omê bide, ku her’ine gundan
xwer’a xurek bik’ir’in.»16Lê Îsa wanr’a got: «Ne hewce ye, ku ew her’in. Hûn xurekê bidine wan.» 17Wana lê vegerand got:
«Li vir pêþtirî pênc nan û du mesyan tiþtekî meyî din t’une.» 18Ewî gote wan: «Wan bînine cem min.»19Îsa ferman da, ku
ew k’om li ser þînayê rûnên. Ewî her pênc nan û her du mesî hildan, berê xwe ezmênda kir, þikirî da û ew nan ker kirin.
Paþê da þagirtan, wana jî da k’omê. 20Hemûyan jî xwarin t’êr bûn û ji hûrikên bermayî jî donzdeh sele t’ijî nan dane hev.
21Ewên ku xwarin, pêþtirî jin û zyarokan, qasî pênc hezar mêr bûn.22Îsa zû p’êyî ser þagirtan kir, ku bik’evine qeyikê û
berî wî derbazî wî alyê golê bin, heta ku xwexa we k’omê verêke. 23Gava wî ew k’om verêkir, t’enê rabû ser ç’yê, ku dua
bike. Gava bû berî êvar, ew li wir t’enê bû, 24lê qeyik îdî ji devê golê dûr k’etibû û nava pêlanda bû, çimkî ba miqabilî wê
bû.25Qereberbangê Îsa li ser golêr’a peya diçû nêzîkî wan dibû. 26Lê gava þagirtan dît, ku ew ser golêr’a peya dihat,
ziravqetî bûn û gotine hev: «Ev xeyal e!» Û wan ji tirsa kire qîr’în. 27Lê Îsa wê demê deng da wan û got: «Ser xwe bin! Ez
im! Netirsin!»28Petrûs lê vegerand got: «Xudan, heger tu yî, ferman bide, ku ez ser avêr’a bême cem te.»
29Îsa got: «Were!» Petrûs ji qeyikê peya bû, ser avêr’a çû, ku her’e cem Îsa. 30Lê gava ewî bayê qayîm dît, tirsya û îdî wê
niqo bûya, qîr’ya got: «Xudan, min rizgar ke!»31Wê demê Îsa destê xwe dirêjî wî kir, ew girt û wîr’a got: «Kêmbawero!
Çima tu dudilî bûy?» 32Gava k’etine qeyikê, ba seqirî. 33Û ewên qeyikêda ew hebandin û gotinê: «Bi rastî jî tu Kur’ê Xwedê
yî.»34Gava ew derbazî wî berî golê bûn, gihîþtine erdê Cênîsartêva. 35Binelyên wê derê ew nas kirin, þandin t’emamya der-
doran, hemû nexaþ anîne cem wî. 36Wan hîvî jê dikir, ku hema serê p’êþa k’inca wî k’evin. Û hemûyên ku lê dik’etin ji
nexaþyên xwe qenc dibûn.

## 15

1Hingê fêrisî û qanûnzanên Orþelîmê hatin û gotine Îsa: 22«Çima þagirtên te pey rê-rizmê kal-bavan naçin? Destneþûþtî
nan dixwin.» 3Wî li wan vegerand, got: «Lê hûn çima rûyê rê-rizmê xweda t’emyên Xwedê didine alîkî?4Çimkî Xwedê t'emî
da got: „Dê û bavê xwer’a hurmetê bike” 5û „Ewê ku nifir li dê û bavê xwe bike, gerekê bê kuþtinê”. 6Lê hûn dibêjin: „Ew
meriv ji wê hurmetkirina dê û bavê xwe aza ye, yê ku dê yan bavê xwer’a bêje: „Ew alîk’arya ku gerekê te ji min bistanda
ew Xwedêr’a p’êþkêþ tê dayînê”. Awa hûn bona xweykirina rê-rizmê xwe xebera Xwedê p’êpes dikin.7Durûno! Îþaya li ser
we hema qenc pêxembertî kirye û gotye: 8„Eva cimeta bi zarê xwe hurmeta min digire, lê dilê wan ji min dûr e.
9Badîhewa minr’a xizmetyê dikin, t’emyên merivan çawa qanûnên min cimetê hîn dikin”.»10Hingê Îsa gazî k’oma hazir li
cem xwe kir û gote wan: «Bibihên û fem bikin! 11Ne ku tiþtê diçe dêv merivan diherimîne, lê çi ku ji dêv dertê, ew
merivan diherimîne.»12Hingê þagirtên wî hatin û gotinê: «Tu dizanî? Gava fêrisyan ev xeber bihîst, dilê wan ji te ma»
13Ewî li wan vegerand got: «Her dara ku Bavê minî ezmana nedaçikandye, wê ji k’okêva bê rakirinê. 14Ji wana vegerin! Ew
kor in û rêberên koran in. Heger kor rêberyê yê kor bike, her du jî wê bik’evine k’orê.»15Petrûs lê vegerand got: «Vê meselê
mer’a þiroveke.»
16Îsa got: «Çima hûn jî femekor in? 17Hê fem nakin, ku çi diçe dêv, derbazî hinavê mêriv dibe û diçe der?18Lê ew tiþtên ku ji
dêv dertên, ew ji dil dertên û hema ev in, ku mêriv diherimînin. 19Çimkî ji dil fikirên xirab dertên: kuþtin, zinêk’arî, qavî,
dizî, derew, buxdan. 20Ev tiþt merivan diherimînin, lê destneþûþtî nanxwarin merivan naherimîne.»21Îsa rabû ji wê derê
çû alyê Sûr û Saydê. 22Û k’ulfeteke kenanî, ku ji wê derê bû, hat, kire gazî û gotê: «Xudan, Kur’ê Dawid, min were rehmê.
Qîza min cina dik’eve, gelekî diçerçire.» 23Lê wî caba wê neda. Þagirtên wî nêzîk bûnê, hîvî jê kirin gotin: «Tiþtekî bêje vê,
ku dûrî me k’eve, çimkî pey me tê û dike qar’eqar’.»24Ewî cab da got: «Ez hatime þandinê, ku t’enê nava pezên mala
Îsraêlêye undabûyîda bim.» 25Lê ew k’ulfet hat xwe avîte nigên wî got: «Xudan, alî min bike!» 26Ewî lê vegerand got: «Ne
baþ e nan ji ber zyarokan hildin û bavêjine ber san.»27Ewê jî got: «Belê Xudan, ne se jî ji wan hûrikên bermayî dixwin, çi
ku ji sifra zyarokan dimîne.» 28Hingê Îsa lê vegerand got: «Evdê, bawerya te mezin e. Bira anegorî xwastina dilê te ter’a
be.» Hema ji wê demêda qîza wê qenc bû.29Îsa ji wir çû ber gola Celîlê û rabû ser ç’yê rûniþt. 30K’omeke giran hate cem, ku
xwer’a gelek seqet, kor, lal, þilûþet û nexaþên mayîn anîbûn û avîtine ber p’yên Îsa. Ewî jî ew qenc kirin. 31Gava k’omê dît,
ku yên lal xeber dan, þilûþet qenc bûn, seqet geryan û ç’evên koran vebûn, zendegirtî man û pesinê navê Xwedê Îsraêlê
dan.32Îsa gazî þagirtên xwe kir û got: «Dilê min ser vê k’omê diþewite. Sê rojê wan e, ku t’evî min in û tiþtekî wanî
xwarinê t’une. Ez naxwazim wana birçî verêkim, ku rêva dilê wan xweva neçe.»

[33]Þagirtên wî gotinê: «Li vê çolêda emê ji k’u haqas nan bînin, ku vê k’oma giran t’êr kin?» [34]Îsa gote wan: «Çend nanên we
hene?» Wana got: «Heft nan û çend mesyên hûr.» [35]Îsa ferman da, ku ew k’om ser erdê rûnê.[36]Ewî her heft nan û ew mesî
hildan þikirî da û ker kirin. Paþê dane þagirtan, þagirtan jî dane ber k’omê. [37]Hemûyan jî t’êr xwarin û ji hûrikên bermayî
jî heft zembîl t’ijî nan dane hev. [38]Ewên ku xwarin, pêþtirî jin û zyarokan, qasî çar hezar mêran bûn.
[39]Paþê ewî ew k’om verêkir, k’ete qeyikekê û hate sînorê Megedanê.

## 16

[1]Fêrisî û sadûqî hatine cem Îsa, ku wî bicêribînin û jê xwastin, ku ew nîþanekê ji ezmên nîþanî wan ke. [2]Ewî li wan
vegerand got: «Çaxê dibe êvar hûn dibêjin: „Hewa wê xaþ be, çimkî ezman sor bûye”.[3]Lê serê sibehê dibêjin: „Îro hewa
wê ne xaþ be, çimkî ezman sor û tarî ye”. Durûno, hûn rûyê ezmên vedinihêrin, ku hewayê çawa be, lê nîþanên zemanan
venanihêrin? [4]Nisilê xirab û xalifî nîþanê dixwaze, lê nîþaneke din wîr’a nayê dayînê, pêþtirî nîþana Ûnis pêxember.» Û
ewî ew hiþtin çû.[5]Gava þagirtên wî derbazî wî alî bûn, bîr kirin nan xwer’a hilnedan. [6]Îsa gote wan: «Miqatî xwe bin,
hevza xwe ji hevîrtirþkê fêrisyan û sadûqyan bikin.» [7]Lê wan nava hevda xeber didan û digotin: «Nanê me t’une, lema
aha dibêje.» [8]Lê Îsa fikirên wan hesya gote wan: «Kêmbawerno! Hûn çima nava hevda xeber didin, ku nanê we t’une?
[9]Hûn hê fem nakin? Nayê bîra we, çawa pênc nanan t’êra pênc hezar merivan kir û we çend sele nanên bermayî hildan?
[10]Û heft nanan jî t’êra çar hezar merivan kir û we çend zembîl nanên bermayî hildan?[11]Hûn çawa fem nakin, ku min bona
nan wer’a negot? Lê ku hûn hevza xwe ji hevîrtirþkê fêrisyan û sadûqyan bikin.» [12]Þagirtan hingê fem kir, ku wî bona
hevîrtirþkê nan wanr’a negot, ku hevza xwe bikin, lê ji hînkirina fêrisyan û sadûqyan.[13]Îsa çû alyê Qeyserya Fîlîpoyê û ji
þagirtên xwe pirsî: «Bi ya merivan Kur’ê Meriv k’î ye?» [14]Wan got: «Hinek dibêjin Yûhennayê nixamdar e, hinek dibêjin
Êlyas e, lê hinekên din dibêjin Yêremîya ye yan jî yek ji pêxemberan e.»
[15]Ewî pirs da wan: «Lê hûn çi dibêjin? Bi ya we ez k’î me?» [16]Þimhûn-Petrûs got: «Tu Mesîh î, Kur’ê Xwedêyê zêndî.»[17]Îsa
gotê: «Xwezî li te, Þimhûnê kur’ê Yûhenna, çimkî xûn û goþt ev yek tu pê nehesandin, lê Bavê minî ezmana. [18]Ez ter’a
dibêjim, ku tu Petrûs î û ser vî qeyayî ezê civîna xwe çê kim û dergên dojê wê pê nikaribin.[19]Û ezê k’ilîtên P’adþatya
ezmana bidime destê te û çi ku li ser erdê tu girêdî, ezmanda jî wê girêdayî be û çi ku li ser erdê vekî, ezmanda jî wê
vekirî be.»
[20]Û Îsa t’emî da þagirtên xwe, ku t’u kesîr’a nebêjin, ku ew Mesîh e.[21]Pey wê yekêr’a Îsa dest pê kir li ber þagirtên xwe
vekir, ku gerekê ew her’e Orþelîmê, ji alyê rûspyanda, serokên k’ahînanda û qanûnzananda gelekî biçerçire û bê kuþtinê,
lê roja sisyan wê ji mirinê zêndî be. [22]Lê Petrûs ew k’aþî alîkî kir, lê hilat got: «Dûrî te Xudan! Ew tiþtê neyê serê te!» [23]Îsa
ser Petrûsda vegerya got: «Dûrî min k’eve, Þeytan! Tu li ber min kevirê lik’umandinê yî, çimkî ew nêt-fikir’a te ne ji
Xwedêda ye, lê ji merivayî ye.»[24]Hingê Îsa þagirtên xwer’a got: «Heger yek dixwaze pey min bê, bira xwe înk’ar ke, xaçê
xwe hilde û pey min bê. [25]Çimkî k’î dixwaze jîyîna xwe rizgar ke, ewê unda bike û k’î ku jîyîna xwe bona min unda bike,
ewê bibîne. [26]Çi qazinc, heger meriv t’emamya dinyayê dest bîne, lê jîyîna xwe unda bike? yan jî meriv ji ber jîyîna xweva
çi dikare bide?[27]Çimkî Kur’ê Meriv wê bi rûmeta Bavê xwe, bi milyaketên xweva bê. Hingê anegorî kirên her kesî wê bide
wan. [28]Ez rast dibêjime we, ku hinekên li vir hizûr, wê mirinê nebînin, heta ku Kur’ê Meriv bi P’adþatya Xweva tê
nebînin.»

## 17

[1]Pey þeþ rojanr’a Îsa Petrûs, Aqûb û birê wî Yûhenna xwer’a hildan, ew birine ser ç’yakî bilind, k’u ew t’enê bûn. [2]Û ew
ber ç’evên wan hate guhastinê. Sifetê wî mîna te’vê biriqî û k’incên wî jî mîna ronayê çîl-qerqaþ bûn.[3]Mûsa û Êlyas
wanva k’ifþ bûn, wîr’a xeber dan. [4]Hingê Petrûs gote Îsa: «Xudan! Ça baþ e, em li vir in! Heger bixwazî, emê sê oban li vir
çê kin, yekê ter’a, yekê Mûsar’a, yekê jî Êlyasr’a.»[5]Ewî hê xeber dida, e’wrekî ronayî hat, li ser wan kire sî, dengek ji e’wr
hat û got: «Ev e Kur’ê minî delal, ez ji wî razî me. Guhdarya wî bikin!» [6]Gava þagirtan ew deng bihîst, deverû xwe avîtin û
saw û tirs ew girtin. [7]Lê Îsa nêzîkî wan bû, dest da wan û got: «Rabin, netirsin.» [8]Wan jî serê xwe bilind kir û pêþtirî Îsa t’u
kes nedîtin.[9]Gava ew ji ç’yê dadik’etin, Îsa t’emî da wan got: «Dîtinoka ku we dît t’u kesîr’a nebêjin, heta ku Kur’ê Meriv ji
nava miryan zêndî nebe.»
[10]Þagirtan jê pirsîn: «Lê çima qanûnzan dibêjin pêþda gerekê Êlyas bê?»[11]Îsa li wan vegerand got: «Hemî, pêþda Êlyasê bê
û ewê her tiþtî saz ke. [12]Lê ez wer’a dibêjim, ku Êlyas hatye jî, lê ew nas nekirin û çawa ku xwastin, usa jî anîne serê wî.
Wê usa jî bînine serê Kur’ê Meriv.»
[13]Hingê þagirtan fem kir, ku bona Yûhennayê nixamdar gote wan.[14]Gava ew hatine cem k’oma merivan, yek nêzîkî Îsa bû,
li ber wî k’ete ser çokan û [15]got: «Xudan, kur’ê min were rehmê! Ew hîvê dik’eve û gelekî diçerçire. Carna dik’eve nava
agir û carna jî nava avê. [16]Min ew anî cem þagirtên te, lê wan nikaribû ew qenc bikira.»[17]Îsa got: «Nisilê nebawer û xalifî!
Heta çiçax ezê t’evî we bim? Heta çiçax ezê we sebir kim? Wî bînine vir cem min.» [18]Îsa lê hilat, cin jê derk’et, xort hema
cîda qenc bû.»[19]Hingê þagirt bi t’enê hatine cem Îsa û jê pirsîn: «Me çima nikaribû ew cin derxista?» [20]Îsa got: «Rûyê
kêmbawerya weda. Ez rast dibêjime we, heger bawerya we hema weke hebeke t’oximê xerdalê be jî, hûnê vî ç’yayîr’a
bêjin: „Ji vir derbazî wî alî be”! wê derbaz be. Û bona we t’u tiþtê zehmet wê t’unebe. [21]Lê ev cisnê aha bi tiþtekî din
dernayê, pêþtirî bi dua û bi rojyê.»[22]Gava þagirt Celîlêda civyan, Îsa gote wan: «Kur’ê Meriv wê bik’eve destê merivan,
[23]ewê wî bikujin, lê roja sisyan wê zêndî be.» Û ewana gelekî ber xwe k’etin.[24]Gava ew hatine Kefernahûmê, xercgirên
duzîvê hatine cem Petrûs û gotinê: «Dersdarê we xercê duzîvê nade?» [25]Wî got: «Belê» wê bide. Gava Petrûs hate malê,
pêþda Îsa jê pirsî: «Þimhûn! Bi t’exmîna te? P’adþayên dinyayê selefan yan xerc ji k’ê distînin, ji bajarvanên xwe yan ji

xerîban?»[26]Petrûs got: «Ji xerîban.» Îsa gotê: «Ku usa ye bajarvan aza ne. [27]Lê ku nebe em van p’iþk bikin, her’e golê,
xeleqa mesyan bavêjê û mesyê pêþin, ku bê girtinê devê wî veke û tuê nalekî çarzîvê bibînî. Wî hilde, dewsa min û xwe
bide wan.»

# 18

[1]Hingê þagirt hatine cem Îsa û gotinê: «Nava P’adþatya Ezmênda k’î ye yê herî mezin?» [2]Îsa gazî zyarokekê li cem xwe kir,
ew nava wanda da sekinandinê [3]û got: «Ez rast dibêjime we, heger hûn venegerin û nebine mîna zyarokan, hûn t’u car
nak’evine P’adþatya ezmana.[4]Awa k’î ku mîna vê zyarokê xwe biç’ûk ke, ew e yê herî mezin P’adþatya ezmanda. [5]Û k’î ku
zyarokeke aha bi navê min qebûl bike, ew min qebûl dike.
[6]Lê k’î ku ji van biç’ûkan yekî, yê ku bawerya xwe min tîne, ji rê derxe, wîr’a hê qenc e, ku beraþek stûyê wîva bê
girêdanê û binê be’rêda bixeniqe.[7]Wey li dinyayê, bona ewên ku merivan ji rê derdixin. Usa nabe, ku ev tiþt nebin, lê wey
li wî, bi k’îjanî meriv wê ji rê dik’evin.
[8]eger dest yan nigê te ji rê te derxe, wî jêke û ji xwe bavêje. Ter’a hê qenc e, ku tu qop yan seqet bik’evî nava jîyînê, ne ku
du dest yan du nigên te hebin û bêyî avîtinê nava agirê heta-ha-tê.[9]Û heger ç’evê te ji rê te derdixe, wî derxe û bavêje.
Ter’a hê qenc e ku tu bi ç’evekî bik’evî nava jîyînê, ne ku bi du ç’evan bêyî avîtinê nava agirê dojê.[10]Miqatî xwe bin, ku
hûn ji van biç’ûkan yekî bêhurmet nekin, çimkî ez dibêjime we, ku milyaketên wan li ezmên t’imê rûyê Bavê minî
ezmana dibînin. [11]Kur’ê Meriv hat, ku yê undabûyî bigere û rizgar bike.[12]Hûn çawa difikirin? Heger sed pezên merivekî
hebin û ji wan yek unda be, ewê nod nehan ç’ya-banyanda nehêle û neçe ya undabûyî negere? [13]Lê çaxê bibîne, ez rast
dibêjime we, ewê bona wê hê gelekî þa be, ne ku bona nod nehên din, ku unda nebûne. [14]Usa jî Bavê weyî ezmana
naxwaze ku ji van biç’ûkan yek unda be.[15]Heger birê te neheqyê li te bike, çaxê tu û ew t’enê ne, wî þîret ke. Heger wî
guhdarya te kir, te îdî birayê xwe qazinc kir. [16]Lê heger guhdarya te nekir, yekî yan duduyên din xwer’a hilde, ku: „Bi
devê du yan sê þehdan her tiþt bê makkirinê”.[17]Lê heger wî guhdarya wan jî nekir, civînêr’a bêje. Û heger guhdarya
civînê jî nekir, bira ew ter’a bibe mîna hêtanos û xercgiran.[18]Ez rast dibêjime we, çi ku hûn li ser erdê girêdin, li ezmên jî
wê girêdayî be û çi ku hûn li ser erdê vekin, li ezmên jî wê vekirî be. [19]Ez dîsa dibêjime we, heger li ser erdê ji we dudu bi
t’ifaq bona tiþtekî dua bikin û bixwazin, Bavê minî ezmana wê bide we. [20]Çimkî li k’u du yan sê meriv bi navê min bicivin,
ez li wir nava wanda me.»[21]Hingê Petrûs nêzîkî wî bû û gotê: «Xudan, çaxê birayê min neheqyê li min bike, ez çend car
gerekê bibaxþînime wî, heta heft caran?» [22]Îsa gotê: «Ez nabêjime te heta heft caran, lê heta heftê caran heft.[23]Çimkî
P’adþatya ezmana mîna vê yekê ye. P’adþakî xwast li xulamên xwer’a hesabê xwe bike. [24]Çaxê dest bi hesaban kir, yek
anîne cem wî, ku dehe hezar telantî deyndarê wî bû. [25]Lê çimkî wî nikaribû ew deyn bida, xweyê wî ferman da, ku ew,
jina wî, lawên wî û hemû hebûka wî bêne firotanê, ku deynê wî bê dayînê.[26]Hingê xulam deverû xwe avîte ber nigê wî, jê
lava kir got: „Li min sebir bike, ezê hemû jî li te vegerînim”. [27]Dilê xweyê wî li ser wî þewitî, ew berda û deynê wî jî
baxþandê.[28]Lê gava ew xulam derk’et çû, rastî xulam-hevalekî xwe hat, yê ku sed zîvî deyndarê wî bû, qir’ika wî girt
got: „Tu çi deyndarê min î bide”! [29]Hingê xulam-hevalê wî xwe avîte ber nigê wî, lava jê kir got: „Li min sebir bike. Ezê li
te vegerînim”.[30]Lê wî guh nedayê, çû ew avîte hebsê, heta ku ew deynê xwe bide. [31]Gava xulam-hevalên wîyî din ev tiþtê
bûyî dîtin, gelekî ber xwe k’etin û çûn her çi ku bibû xweyê xwer’a gotin.[32]Hingê xweyê wî gazî wî kir û got: „Xulamê
xirab! Min deynên te hemû bona wê yekê baxþande te, ku te ji min lava kir. [33]Lê gelo ne lazim bû, ku tu jî li xulam-hevalê
xwe bihatayî rehmê, çawa ez te hatime rehmê?”[34]Û xweyê wî hêrs k’et, ew da destê celatan, heta ku ew deynên xwe hemû
bida. [35]Usa jî Bavê minî ezmana wê li serê we her kesî bike, heger hûn bi hub û rez nebaxþînine birayê xwe.»

# 19

[1]Gava Îsa ew xeber ser hevda anîn, ji Celîlê derk’et hate sînorê Cihûstanê, wî alyê ç’emê Ûrdunê. [2]Gelek k’om pey wî çûn û
ewî li wir ew qenc kirin.[3]Hineke ji fêrisyan nêzîkî wî bûn, ku wî bicêribînin, jê pirsîn: «Gelo anegorî Qanûnê rast e, ku
bona her sedemê mêr jina xwe berde?»
[4]Ewî caba wan da got: «Gelo we ne xandye, serê-sêrîda Efirandar „ew nêr û mê xuliqandin”?[5]Û got: „Ji ber vê yekê mêr wê
dê û bavê xwe bihêle û xwe li jinê bigire û her du wê bibine bedenek.” [6]Awa îdî ew ne dudu ne, lê bedenek in. Lema ewên
ku Xwedê kirine yek, bira meriv wan ji hevdu neqetîne.»[7]Wan gote wî: «Lê çima Mûsa t’emî da, ku mêr nivîsara
jinber’danê bide jinê û wê berde?» [8]Ewî li wan vegerand got: «Mûsa ji dest serhiþkya we destûr da, ku hûn jinên xwe
ber’din. Lê serê-sêrîda ne usa bû. [9]Ez wer’a dibêjim, k’î jina xwe bêy me’nya qavyê berde û yeke din bistîne, ew zinêk’aryê
dike.»[10]Þagirtên wî gotinê: «Heger nava jin û mêrda zehmeteke aha heye, hê qenc e qet hevdu nestînin.» [11]Îsa got: «Her kes
vê yekêda qewat nake, lê t’enê ew, k’îjananr’a hatye dayînê. [12]Çimkî nemêr hene, ku ji zikmakyêda usa bûne, nemêr jî
hene, ku bi destê merivan bûne nemêr û nemêr jî hene, ku bona P’adþatya ezmana wana xwe kirine nemêr. K’ê dikare
xwe zeft ke, bira usa bike.»[13]Hingê zyarok anîne cem Îsa, ku destên xwe dayne ser wan û dua-dirozge li wan bike. Lê
þagirtên wî li yên danîn hilatin. [14]Îsa got: «Bira ew zyarok bêne cem min, pêþya wan negirin, çimkî P’adþatya ezmana
p’ara yên usa ye.» [15]Û Îsa destên xwe danîne ser wan, dua-dirozge kir û ji wir çû.[16]Yek nêzîkî wî bû, got: «Dersdarê qenc!
Ez çi qencyê bikim, ku jîyîna heta-ha-tê war bim?» [17]Ewî gote wî: «Tu çima minr’a dibêjî qenc? T’enê Yekî qenc heye:
Xwedê. Lê heger tu dixwazî, bik’evî jîyîna heta-ha-tê, t’emyên Xwedê bîne sêrî.»[18]Ewî ji Îsa pirsî: «K’îjan in?» Îsa got:
«Nekuje, zinêk’aryê neke, nedize, þehdetya derew nede, [19]dê û bavê xwer’a hurmetê bike û hevalê xwe weke xwe hiz
bike.»[20]Wî cahilî got: «Min ev hemû ji zyarotyêda xwey kirine. Îdî çi kêmasya min heye?» [21]Îsa got: «Heger tu dixwazî
k’amil bî, her’e hebûka xwe bifiroþe bide feqîran, hingê xezna te wê li ezmana hebe. Û pey min were.» [22]Gava wî cahilî ev

xeber bihîst, ber xwe k’et, çû, çimkî hebûka wî gelek bû.23Hingê Îsa gote þagirtên xwe: «Ez rast dibêjime we,
dewlemendanr’a zehmet e, ku bik’evine P’adþatya ezmana. 24Ez dîsa dibêjime we, deve wê qula derzyêr’a hê rihet derbaz
be, ne ku dewlemend bik’eve P’adþatya Xwedê.»25Gava þagirtan ev yek bihîst, gelekî þaþ man û gotin: «Îdî k’î dikare
rizgar be?» 26Îsa li wan nihêrî, got: «Ew tiþt ji destê mêriv nayê, lê ji destê Xwedê her tiþt tê.»
27Wê gavê Petrûs lê vegerand got: «Awa me her tiþt hiþtye û pey te hatine, lê axirya me wê çawa be?»28Îsa gote wan: «Ez
rast dibêjime we, çaxê Kur’ê Meriv Dinya Nûda li ser T’extp’adşê xweyî rûmetê rûnê, hûnên ku pey min tên, ser donzdeh
k’ursyan rûnên û dîwana donzdeh qebîlên Îsraêlê bikin.29Û her kesê ku mala xwe yan birayên xwe yan xûþkên xwe, yan
bavê xwe yan dya xwe, yan lawên xwe, yan erdên xwe bona navê min hiþtine, ewê sed bare bistîne û jîyîna heta-ha-tê jî
wê war be. 30Lê gelekên pêþ wê bibine paþ û gelekên paþ wê bibine pêþ.»

## 20

1«P’adþatya ezmana mîna vê yekê ye: Merivekî xweymilk’ sibehê zû rabû, ku bona baxê xwe k’arkeran bigire. 2Ewî
k’arkeranr’a peyman girêda, ku rojê zîvekî bide wan û ew þandine nava baxê xwe.3Nêzîkî siheta nehan derk’et, hinekên
din dîtin, ku betal bazarêda sekinî bûn, 4gote wan: „Hûn jî her’ine nava baxê min û çi maþ wer’a dik’eve, ezê bidime we”.
Ew jî çûn.5Dîsa siheta donzdehan û siheta sisyan derk’et û usa kir. 6Û nêzîkî siheta pêncan derk’et, hinekên din jî dîtin, ku
betal sekinî bûn, gote wan: „Çima hûn li vir t’emamya rojê betal sekinî ne”? 7Wan gote wî: „T’u kesî em bi k’irê nebirin”.
Ewî wanr’a got: „Hûn jî her’ine nava baxê min”.8Berî êvarê, xweyê bax wek’îlê mala xwer’a got: „Gazî k’arkeran ke, maþê
wan bide, ji yên paþin dest pê ke heta yên pêþin”. 9Ew k’arkerên ku siheta pêncan hatibûn, ji wan her yekî zîvek stand.
10Gava yên pêþin jî hatin, ew difikirîn, ku wê zêde bistînin. Lê ji wan her yekî jî zîvek stand.11Gava maþê xwe standin,
hindava xweyê baxda bîna xwe teng kirin û gotin: 12„Me t’emamya giranya rojê û germa wê k’iþand, lê evên ku
paþwaxtyê hatin, qet sihetekê jî nexebitîn, te ew weke me kirin”.13Malxê ji wan yekîr’a got: „Heval! Ez neheqyê li te
nakim. Tu minr’a li ser zîvekî qayl nebûyî? 14Maþê xwe bistîne û her’e. Ez dixwazim çawa ku min da te, usa jî bidime evê
paþin.15Yan îzina min ser hebûka min nîne, ku ez çawa bixwazim usa bikim? yan tu hevsûdyê dikî, ku ez merd im?”
16Û aha yên paþ wê bibine pêþ û yên pêþ wê bibine paþ, çimkî gazîkirî gelek in, lê hilbijartî hindik.»17Çaxê Îsa radibû
Orþelîmê, her donzdeh þagirtên xwe xwer’a birin û rêda baþqe gote wan: 18«Va ye em hevraz diçine Orþelîmê. Kur’ê
Meriv wê bik’eve destê serokên k’ahînan û qanûnzanan. Ewana wê bona wî qirara kuþtinê derxin 19û wî bidine destê
hêtanosan, ku qerfê xwe wî bikin, bidine ber qamçyan û xaç kin. Lê roja sisyan ewê ji mirinê zêndî be.»20Hingê dya
kur’ên Zebedî t’evî her du kur’ên xwe hate cem Îsa, ser nigên wîda ta bû, tiþtek jê dixwast. 21Îsa jê pirsî: «Tu çi dixwazî?»
Wê got: «Bêje, ku ev her du kur’ên min, yek alyê teyî rastê, yê din jî alyê teyî ç’epê rûnên, nava p’adþatya teda.»22Lê Îsa li
wan vegerand got: «Hûn nizanin çi dixwazin. Gelo hûn dikarin ji wê k’asê vexwin, ya ku ezê vexwim yan bi wê nixamtinê
bêne nixamtinê, bi k’îjanê ezê bême nixamtinê?» Wan gotê: «Belê, em dikarin.» 23Ewî gote wan: «Rast e, hûnê wê k’asa
min vexwin û bi wê nixamtinê bêne nixamtinê, lê destûra rûniþtina li alyê minî rastê û ç’epê ne destê minda ye. Ew cî
bona wan in, k’îjananr’a ji Bavê minda hatine hazirkirinê.»
24Her dehe þagirtên din gava ev bihîstin, dilê wan ji her du bira ma.25Lê Îsa ew gazî cem xwe kirin û got: «Hûn zanin, ku
mîrên miletan zordestyê cimeta xwe dikin û giregirên wan hikumî ser wan dikin. 26Lê nav weda gerekê usa nebe. K’î nav
weda dixwaze bibe yê mezin, gerekê bibe berdestyê we. 27Û li nav weda k’î ku dixwaze bibe pêþ, gerekê bibe xulamê we,
28çawa Kur’ê Meriv: ew nehatye ku wîr’a berdestyê bikin, lê ku ew berdestyê bike û canya xwe bide, ku gelekan
bik’ir’e.»29Gava ew ji Erîhayê derk’etin, k’omeke giran da pey wî çû. 30Du kor ser wê rê rûniþtibûn. Gava wana bihîst ku Îsa
derbaz dibe, kirine qîr’în û gotinê: «Xudan, Kur’ê Dawid, me were rehmê.» 31Wê k’omê li wan hilat, ku dengê xwe bibir’in,
lê wana hê kire qîr’în û gotinê: «Xudan, Kur’ê Dawid, me were rehmê!»32Îsa sekinî, gazî wan kir û got: «Hûn çi ji min
dixwazin, ku ez bona we bikim?» 33Wana gote wî: «Xudan, bira ç’evên me vebin.» 34Dilê Îsa li ser wan þewtî û dest danî ser
ç’evên wan. Û hema cîda ç’evên wan dîtin, dane pey Îsa çûn.

## 21

1Gava ew nêzîkî Orþelîmê bûn, hatine gundê Beytfacê, berbi ç’yayê Zeytûnê. Hingê Îsa du þagirtên xwe þandin 2û gote
wan: «Her’ine wî gundê pêþberî xwe û hûnê k’ereke girêdayî, ceþik li ber, bibînin. Wan vekin bînine cem min. 3Heger yek
tiþtekî bêje we, hûn bêjinê: „Xudanr’a lazim in” û ewê zû wan biþîne.»4Eva usa bû, ku ew gotina pêxember bê sêrî, ku
dibêje: 5«Bêjine Qîzika Sîyonê: „Va p’adþê te tê cem te, milûk û li k’erê û ceþika k’erê syarbûyî”.»6Þagirt çûn û çawa Îsa
t’emî dabû, wan usa kir. 7K’er û ceþik anîn, k’incên xwe avîtine ser wan û Îsa li wan syar bû. 8K’omeke giran k’incên xwe li
ser rê radixistin, hinekan jî çiqilên daran dibir’în û li ser rê radixistin.9K’oma ku pêþya wî û pey wîva diçûn, dikire qîr’în
û digot: «Hosanna Kur’ê Dawidr’a! Bimbarek e ewê ku bi navê Xudan tê! Hosanna li jorê!»
10Gava Îsa çû Orþelîmê, bajar pêda-pêda hejya û pirsîn: «Ev k’î ye?» 11Cimetê got: «Eva, Îsayê pêxember e, ji Nisreta
Celîlê.»12Îsa çû p’aristxana Xwedê û hemûyên ku p’aristxanêda dik’ir’în û difirotin derxistin. T’extên serafan û k’ursyên
kewfiroþan welgerandin 13û gote wan: «Nivîsar e: „Mala min wê mala duakirinê bê hesabê”, lê we ew kirye þkefta
t’alank’aran!»
14Li wir, p’aristxanêda kor û seqet hatine cem û ewî ew qenc kirin.15Lê çaxê serokên k’ahînan û qanûnzanan ew
k’iryametên ku Îsa kirin dîtin û usa jî ew zyarokên ku p’aristxanêda dikirine qîr’în, digotin: «Hosanna Kur’ê Dawidr’a!»
hêrs k’etin 16û gotine wî: «Tu dibihêyî ev çi dibêjin?» Îsa gote wan: «Belê. We qet nexandye, ku: „Te pesindayîn bi zarên
t’ifalan û þîrxuran meyaser kir” ?»


generated on Thu Aug 7 16:57:02 2025

[17]Ewî ew li wir hiþtin, ji bajêr derk’et çû Beytanyayê û þev li wir ma.[18]Sibehê zû, gava ew vegerya bajêr, birçî bû. [19]Li ser rê
dareke hêjîrê dît, nêzîkî wê bû, lê pêþtirî belgan tiþtekî din pêva nedît û darêr’a got: «Ji vir hada tuê heta-ha-tê ber nedî!»
Û hema cîda dar hiþk bû.[20]Çaxê þagirtan ev yek dît, zendegirtî man û gotin: «Çawa ev dara hêjîrê zû hiþk bû?» [21]Îsa caba
wan da û got: «Ez rast dibêjime we, heger bawerya we hebe û hûn dudilî nebin, ne t’enê hûnê çi ku hate serê vê dara
hêjîrê bikin, lê heger vî ç’yayîr’a jî bêjin: „Rabe xwe bavêje be’rê”, wê bibe. [22]Heger bawerya we hebe, hûn çi ku nava
duada bixwazin, hûnê bistînin.»[23]Gava ew hate p’aristxanê û cimet hîn kir, serokên k’ahînan û rûspyên cimetê hatine cem
wî û gotinê: «Tu bi çi hikumî van kiran dikî? K’ê ev hikum daye te?» [24]Îsa li wan vegerand got: «Ezê jî tiþtekî ji we
bipirsim. Heger we caba min da, ezê jî bêjime we bi çi hikumî van kiran dikim.[25]Hikumê nixamtina Yûhenna ji k’u bû? Ji
ezmên bû yan ji merivan?» Ew nava hevda þêwrîn û gotin: «Heger em bêjin: „Ji ezmên bû”, ewê bêje me: „Lê çima we
bawerya xwe wî neanî”? [26]Lê heger em bêjin: „Ji merivan bû”, em ji cimetê ditirsin, çimkî hemû qebûl dikin, ku Yûhenna
pêxember bû.» [27]Wan caba Îsa da û got: «Em nizanin.» Ewî jî gote wan: «Ez jî nabêjime we, ku ez bi çi hikumî van kiran
dikim.[28]Got: «Weva çawa k’ifþ dibe? Du kur’ên yekî hebûn. Ewî kur’ê xweyî mezinr’a got: „Lawo! Îro her’e nava baxda
bixebite”. [29]Wî lê vegerand got: „naçim”, lê paþê p’oþman bû, çû. [30]Hingê bav çû cem yê din, ewî jî aha got: „Belê, ezê
her’im, bavo”, lê neçû.[31]Niha ji van her du kur’an k’îjanî guhdarya bavê xwe kir?» Wan gotê: «Yê mezin.» Îsa jî gote wan:
«Ez rast dibêjime we, ku xercgir û qav berî we wê bik’evine P’adþatya Xwedê. [32]Çimkî Yûhenna hat, ku rya rastyê nîþanî
we bike, we bawerya xwe wî neanî, lê xercgir û qavan bawerya xwe wî anîn. We ev tiþt dît jî, lê dîsa we xwe neþkênand,
ku bawerya xwe wî banya.[33]Meseleke din jî bibihên. Merivekî xweymilk’ hebû, bax danî, dorê sûr kir, hewzek têda k’ola,
kelak çê kir û ew da baxvanan û çû welatekî din. [34]Çaxê dema bert’opkirinê nêzîk bû, ewî xulamên xwe þandine cem
baxvanan, ku ji berê baxê wî wîr’a bînin.[35]Baxvanan xulamên wî girtin, yekî xistin, yê din kuþtin û yekî din jî dane ber
keviran. [36]Ewî xulamne din þandin, ji yên pêþin gelektir û wan usa jî anîne serê wan. [37]Axiryê, ewî kur’ê xwe þande cem
wan û got: „Belkî ji kur’ê min þerm bikin”.[38]Lê gava baxvanan kur’ê wî dît, gotine hev: „Ev e warxurê wî. Werin em vî
bikujin û bibine xweyê mîrata wî”. [39]Û ew girtin ji bax derxistine der û kuþtin.[40]Çaxê xweyê bax bê, wê çi serê wan
baxvanan bike?» [41]Gotine wî: «Wê qir’a wan neheqan bîne û bax bide baxvanên usa, yên ku wê waxtda berê baxê wî
bidinê.»[42]Îsa gote wan: «We nivîsarêda qet nexandye? „Ew kevirê ku hosteyan wêda avît, bû serê enîþkê. Ev yek ji
Xudanda bû û li ber ç’evên me heyr-hujmek’ar e”![43]Bona vê yekê ez dibêjime we, ku P’adþatya Xwedê ji we wê bê
standinê û miletekî usar’a bê dayînê, ku bona wî ber bîne. [44]K’î ku ser vî kevirîda bik’eve, wê bip’iþire û ew kevir ser k’êda
bik’eve, wê wî bihincir’îne.»[45]Gava serokên k’ahînan û fêrisyan meselên wî bihîstin, fem kirin ku wî ew anîne ser wan.
[46]Xwastin wî bigirin, lê ji cimetê tirsyan, çimkî wan ew weke pêxemberekî qebûl dikirin.

# 22

[1]Dîsa Îsa bi mesele wanr’a xeber da got: [2]«P’adþatya ezmana mîna vê yekê ye: P’adþakî dewata kur’ê xwe kir. [3]Ewî
xulamên xwe þandin, ku gazî xandyên dewatê kin, lê wan nexwast bên.[4]Xulamne din þandin û got: „Bêjine xandyan: Min
canege û heywanên xweye dermalîkirî serjêkirine û nanê xwe hazir kirye, her tiþt hazir e. K’erem kine dewatê!”[5]Lê wan
piþt guhê xweva avît: yek çû erdê xwe, yê din k’ir’în-firotana xwe. [6]Yên mayîn jî xulamên wî xistin û kuþtin. [7]Gava p’adþê
bihîst, hêrs k’et, ordya xwe þand, yên ku xulamên wî kuþtin qir’a wan anî, bajarê wan jî þewtand.[8]Hingê wî xulamên
xwer’a got: „Dewat hazir e, lê xandî ne hêja bûn. [9]Rabin her’ine serê rya û k’ê ku bibînin, gazî dewatê kin”. [10]Û ew xulam
derk’etine serê ryan, k’î ku dîtin, qenc û xirab, hemû civandin û mala dewatê bi xandyanva t’ije bû.[11]Lê gava p’adþa çû
hindur, ku xandyan binihêre, merivek wir dît, ku k’inca dewatê lê nîbû, [12]gotê: „Heval! Tu çawa bêy k’inca dewatê k’etî
vir”? Wî deng nekir.[13]Wê demê p’adþê berdestyanr’a got: „Dest û p’yên wî girêdin, bigirin bavêjine tarya derva. Li wir wê
bibe qîr’în û ç’irke-ç’irka diranan.” [14]Awa gazîkirî gelek in, lê hilbijartî hindik.»[15]Hingê fêrisî çûn hev þêwrîn, ku çawa wî
bi xeberan bigirin. [16]Wan þagirtên xwe t’evî Hêrodesyan þandine cem wî û gotinê: «Dersdar! Em zanin, ku tu yekî rast î û
rya Xwedê rast hîn dikî. Minetê ji t’u kesî nakî, çimkî firqyê nakî nava merivan. [17]Niha mer’a bêje, bi fikira te, lazim e em
xerc bidine qeyser yan na?»[18]Îsa qelpya wan fem kir, got: «Çima hûn min dicêribînin, durûno? [19]P’erê xercdayînê nîþanî
min kin.» Wan zîvek wîr’a anî.[20]Îsa ji wan pirsî: «Ev nivîsar û sifet yên k’ê ne?» [21]Gotine wî: «Yên Qeyser in.» Hingê gote
wan: «Awa çi yên Qeyser in, bidine Qeyser û çi yên Xwedê ne, bidine Xwedê.» [22]Gava wan bihîst zendegirtî man, ew hiþtin
û çûn.[23]Wê rojê ji sadûqyên ku digotin mirî zêndî nabin, hinek hatine cem Îsa, jê pirsîn [24]û gotinê: «Dersdar! Mûsa
got: „Heger yek bêzuret bimire, birayê wî bira jina wî bistîne û zuret pey birê xwe xe.”[25]Awa heft bira li cem me hebûn.
Birê mezin zewicî, bêzuret mir, jina wî birayê wîr’a ma. [26]Usa jî hate serê birayê dudan û yê sisyan, xulese ev yek hate
serê her heftan jî. [27]Li pey hemûyanr’a ew jin jî mir. [28]De niha bêje, Roja Zêndîbûna miryan ew jin wê ji wan her heftan
bibe jina k’îjanî? Çimkî hemûyan jî ew standibû.»[29]Îsa li wan vegerand got: «Hûn xalifî ne, çimkî ne nivîsaran zanin, ne jî
qewata Xwedê. [30]Roja Zêndîbûna miryan ne wê bizewicin, ne jî mêr kin, lê wê mîna milyaketên ezmên bin.[31]Lê derheqa
zêndîbûna miryanda, gelo we xebera Xwedêye wer’a gotî nexandye? [32]„Ez Xwedêyê Îbrahîm, Xwedêyê Îshaq û Xwedêyê
Aqûb im.” Xwedê ne Xwedêyê miryan e, lê Xwedêyê zêndyan e.» [33]Gava k’oma hazir ev tiþt bihîstin, li ser hînkirina wî
zendegirtî man.[34]Lê gava fêrisyan bihîst, ku Îsa sadûqî dengbir’î kirin, hemû li cîkî civyan. [35]Hingê ji wan qanûnzanan
yekî pirs da Îsa, ku wî bicêribîne û got: [36]«Dersdar. Qanûnêda t’emya here mezin k’îjan e?»[37]Îsa gotê: «„Xudan Xwedê xwe
hiz bike: bi t’emamya dilê xwe, bi t’emamya kesa xwe û bi t’emamya hiþê xwe.” [38]Ev e t’emya pêþin û here mezin.[39]Û ya
dudan jî mîna vê ye: „Hevalê xwe weke xwe hiz bike”. [40]Hemû nivîsarên pêxemberan û Qanûnê ji van her du t’emyanva
girêdayî ne.»[41]Gava fêrisî civyan, Îsa ji wan pirsî [42]û got: «Hûn bona Mesîh çi difikirin, t’exmîna we ew kur’ê k’ê ye?»
Gotine wî: «Kur’ê Dawid e.»[43]Îsa gote wan: «Lê çawa Dawid bi Ruh wî Xudanê xwe hesab dike? Çimkî wî got: [44]„Xudan gote


generated on Thu Aug 7 16:57:02 2025

Xudanê min: Li alyê minî rastê rûnê, heta ku ez dijminên te bikime binê p’yên te.’’45Heger Dawid wî „Xudan’’ hesab dike,
ew çawa dibe kur’ê wî?» 46Û t’u kes nikaribû caba wî bida û li pey wê rojêr’a t’u kesî newêrbû pirsek ji wî bikira.

## 23

1Hingê Îsa k’oma merivanr’a û þagirtên xwer’a xeber da got: 2«Qanûnzan û fêrisî ser k’ursyê Mûsa rûniþtine. 3Îdî ew çi
wer’a bêjin xwey kin û biqedînin, lê mîna wan nekin, çimkî ew dibêjin, lê nakin.4Barên giran û zehmet girêdidin, datînine
ser milên merivan, lê ew xwexa naxwazin t’ilya xwe jî bidinê. 5Ew her tiþtî dikin, ku li ber merivan bêne k’ifþê. Keþkûlên
p’rtûkane mezin mil û enyên xweva girêdidin û rîþyên k’incên xwe dirêj dikin.6Þayanda serê jorin hiz dikin, kinîþtanda
k’ursyên pêþin, 7Ew hiz dikin bazaranda silavê bistînin û meriv jî bêjine wan: „Mamoste’’.8Lê bira wer’a
nebêjin: „Mamoste’’, çimkî dersdarê we yek e, ew Mesîh e û hûn hemû jî bira ne. 9Li ser dinyayê hûn t’u kesîr’a
nebêjin: „Bavo’’, çimkî Bavê we yek e, ew li ezmên e. 10Ne jî wer’a bêjin: „Rêber’’, çimkî Rêberê we yek e, ew Mesîh e.11Bira
nava weda yê herî mezin bibe berdestyê we. 12K’î ku xwe bilind bigire, ewê nimiz be, lê k’î xwe nimiz bigire, ewê bilind
be.13Lê wey li we qanûnzan û fêrisyên durû! Hûn derê P’adþatya ezmana li ber merivan dadidin. Ne hûn dik’evinê û ne jî
wan dihêlin, yên ku dixwazin bik’evinê. 14Wey li we qanûnzan û fêrisyên durû! Ku hûn malên jinebyan hûfî xwe dikin, lê
alîkîva duayê xwe dirêj dikin, ku ji merivan bêne dîtinê. Bona vê yekê dîwana we wê hê giran be. 15Wey li we qanûnzan û
fêrisyên durû! Hûn li be’r û bejan digerin, ku yekî nebawer bînine ser rya xwe. Û gava hûn digihîjine meremê xwe, hûn
wî du car ji xwe zêdetir dikine p’ara dojê.16Wey li we rêberên kor, hûn dibêjin: „K’î ku bi p’aristxanê sond dixwe, ne tiþtek
e. Lê k’î ku bi zêr’ê p’aristxanêda sond dixwe, dibe deyndar’’. 17Hey bêaqil û korno! K’îjan mezin e, zêr’ yan p’aristxane, ku
zêr’ helal dike?18Usa jî hûn dibêjin: „K’î ku bi qurbangehê sond dixwe ne tiþtek e, lê k’î bi hedya ser qurbangehê sond
dixwe, dibe deyndar’’. 19Hey bêaqil û korno! K’îjan e mezin? Hedî yan qurbangeh, ku hedyê helal dike?20Awa, k’î bi
qurbangehê sond dixwe, ew him bi wê sond dixwe, him jî bi hemû tiþtên ku ser wê hene. 21K’î bi p’aristxanê sond dixwe,
ew him bi wê sond dixwe, him jî bi wî, k’î wêda dimîne. 22Û k’î bi ezmên sond dixwe, ew him bi T’extp’adşê Xwedê sond
dixwe, him jî bi yê ser rûniþtî.23Wey li we qanûnzan û fêrisyên durû! Hûn dehekên pûngê, anîsoyê û kêmûnê didin, lê
tiþtên Qanûnêye pêþ: heqyê, rehmê û baweryê davêjine piþt xwe. We gerekê ev bikirana û dest ji tiþtên mayîn
nek’iþanda. 24Rêberên kor! Hûn k’ermêþan diparzinin, lê deveyan dadiqurtînin!25Wey li we qanûnzan û fêrisyên durû!
Hûn t’as û fîncanan rûyê dervava paqij dikin, lê hindurva t’ijî timayî û ç’evbirçîtî ne. 26Fêrisyê kor! Berê pêþda hindurê
fîncan û t’asê paqij ke, ku derva jî paqij be.27Wey li we qanûnzan û fêrisyên durû! Hûn mîna t’irbên sipîkirî ne, ku ji derva
bedew k’ifþ dibin, lê hindurva bi hestûyên miryan û bi her heramyêva t’ijî ne. 28Usa jî hûn, ji derva merivanva rast têne
k’ifþê, lê hindurva durû û neheq in.29Wey li we qanûnzan û fêrisyên durû! Hûn t’irbên pêxemberan çê dikin û t’irbên yên
rast dixemilînin 30û dibêjin: „Heger em rojên bavên xweda bûna, meyê t’evî wan xûna pêxemberan nerêta’’. 31Îdî hûn
dibine þehdê xwe, ku hûn lawên wan bavan in, yên ku pêxember kuþtine.32De kêmasya xirabyên bavên xwe t’emam kin.
33Me’rno! Ç’êjikên me’ran! Hûnê çawa ji dîwana dojê birevin?34Lema ezê pêxemberan, serwaxtan û qanûnzanan biþînime
cem we û hûnê ji wan hinekan bikujin, xaç kin, hinekan jî kinîþtên xweda bidine ber qamçyan û bajar-bajar bizêrînin.
35Hemû xûna bêsûce ku li ser rûyê erdê hatye rêtinê wê bê ser we, ji xûna Habîlê bêsûc heta xûna Zekeryayê kur’ê
Berexya, ku we nava p’aristxanê û qurbangehêda kuþt. 36Ez rast dibêjime we, ev hemû xûn wê bêne serê vî nisilî.
37Orþelîm! Orþelîm! Te pêxember dikuþtin û þandyên cem xwe didane ber keviran! Çend caran min xwast lawên te
bicivanda, çawa mirîþk cûcûkên xwe dicivîne bin baskên xwe, lê te nexwast! 38Awa mala te wê xirabe û destjêberdayî
bimîne. 39Ez dibêjime we, îdî ji vir hada hûn min nabînin, heta ku bêjin: „Bimbarek e ewê ku bi navê Xudan tê’’.»

## 24

1Gava Îsa ji p’aristxanê derk’et çû, þagirt çûne cem wî, ku xanyên p’aristxanê nîþanî wî kin. 2Îsa wanr’a got: «Hûn van
hemûyan dibînin? Ez rast dibêjime we, ev hemûyên jî wêran bin, vê derê kevirê li ser kêvir nemîne!»3Gava ser ç’yayê
Zeytûnê ew rûniþtibû, þagirtên wî t’enê hatine cem û jê pirsîn: «Bêje me, ev tiþt wê çiçax bibin? Û nîþana hatina te û
axirya vê dinyayê wê çi be?» 4Îsa caba wan da, got: «Miqatî xwe bin, ku t’u kes we nexapîne, 5çimkî gelek wê bi navê min
bên û bêjin: „Ez im Mesîh’’ û wê gelekan bixalifînin.6Hûnê deng û be’sê þer’an bibihên, lê miqatî xwe bin, xwe unda
nekin. Gerekê ev tiþt bibin, lê ew hê ne axirî ye. 7Miletê rabe li ser milet, p’adþatî li ser p’adþatyê, cî-cyan xelayî, nexaþya
mirinê û erdhej wê bibin. 8Lê ev hemû mîna êþa k’ulfetê ye, ku dest pê dike lê digire.9Hingê wê we bidine te’lî-tengyê, we
bikujin û bona navê min hûnê ber ç’evên her miletan reþ bin. 10Hingê gelek wê ji rê bik’evin, wê nemamya hevdu bikin û
ber ç’evê hev reþ bin. 11Gelek pêxemberên derew wê derk’evin û gelekan bixalifînin.12Ji dest zêdebûna neheqyê hizkirina
gelekan wê sar be. 13Lê k’î heta axiryê teyax ke, ewê rizgar be. 14Û ev Mizgînya P’adþatyê wê li nava t’emamya dinyayêda
bê dannasînkirinê, ku her miletanr’a bibe þehdetî û hingê axirî wê bê.15Çaxê hûn Heramya wêrankirinê li cyê pîroz cîgirtî
bibînin, çawa ku Danîyêl pêxember got, (yê bixûne bira fem bike), 16hingê ewên ku Cihûstanêda ne bira birevine ç’yan.
17Yê ser xanî ye, bira danek’eve, ku ji malê tiþtekî hilde. 18Û ewê ku li k’ewþên e, bira venegere ku p’otê xwe hilde.19Lê li
wan rojanda wey li hemlan û destdergûþan! 20Dua bikin, ku reva we nek’eve zivistanê yan jî roja þemyê. 21Çimkî hingê
tengasîke usa mezin wê bibe, ku ji destpêka dinyayêda heta niha mîna wê nebûye û ne jî wê bibe. 22Heger ew roj kin
nebûna, t’u bedenê rizgar nebûya, lê boy xatirê hilbijartyan ew roj wê kin bin.23Hingê, heger yek wer’a bêje: „Va ye Mesîh
vir e’’ yan „Wa ye wir e’’, bawer nekin. 24Çimkî mesîh û pêxemberên derew wê derên, nîþan û k’iryametên mezin bikin,
ku bikaribin hilbijartyan jî bixalifînin. 25Va ye min hê pêþda wer’a got.26Heger wer’a bêjin: „Va ye Mesîh çolêda ye’’,
dernek’evin, yan: „Wa ye, ew wê odêda ye’’, bawer nekin. 27Çimkî çawa birûsk ji rohilatê birq dide û heta roavayê k’ifþ

dibe, wê hatina Kur’ê Meriv jî bi wî awayî be. 28«Li k’u cendekên mirî hebin, teyrê jî li wir t’op bin.»29Pey tengasya wan
rojanr’a, rûyê te’vê wê bê girtinê û hîvê jî ronaya xwe nede, steyrk wê ji ezmên bik’evin û t’opên ezmana wê ji ryên xwe
derk’evin.30Hingê nîþana Kur’ê Meriv wê li ezmên k’ifþ be û her miletên dinyayê wê þînê bikin, çaxê bibînin Kur’ê Meriv
li ser e’wrên ezmên bi qewat û rûmeta mezin tê. 31Ewê milyaketên xwe bi dengê bor’yane bilind biþîne û hilbijartyên wî
wê ji her çar qulban bicivînin: ji p’er’ekî ezmên heta p’er’ê din.32Ji dara hêjîrê dersekê hîn bin. Çaxê çiqilên wê ter’ dibin û
belgên wê dibiþkivin, îdî hûn zanin, ku havîn nêzîk e. 33Usa jî çaxê hûn van her tiþtan bibînin, bizanibin ku ev tiþt nêzîk
e, li ber þêmîkê ye.34Ez rast dibêjime we, eva nisila derbaz nabe, heta ku ev hemû tiþt nebin. 35Erd û ezmanê derbaz bin, lê
gotinên min t’u car derbaz nabin.36Lê bona wê rojê û wê sihetê t’u kes nizane, ne jî milyaketên ezmana lê t’enê bav.37Çawa
ku li rojên Nuhda bûn, li dema hatina Kur’ê Merivda jî wê usa bibin. 38Çawa ku wan rojên berî tofanê merivan dixwarin,
vedixwarin, dizewicîn û mêr dikirin, heta wê roja ku Nuh k’ete gemyê 39û meriv pê nehesyan, heta ku lêyî rabû û hemû jî
xeniqandin. Li dema hatina Kur’ê Merivda jî wê usa be.40Hingê du meriv wê li nav erdê xweda bin, yekê bê hildanê û yê
din bê hiþtinê. 41Û du k’ulfet wê li ser k’arê destarekî bin, yekê bê hildanê, ya din bê hiþtinê. 42Awa hiþyar bimînin, çimkî
hûn nizanin Xudanê weyê k’îjan rojê bê.43Lê vê yekê bizanibin, heger xweyê malê bizanibûya, ku k’îjan dema þevêda dizê
bihata, wê hiþyar bima û nehiþta, ku mala wî derevekira. 44Lema, hûn jî hazir bin, çimkî Kur’ê Meriv wê siheteke usada
bê, ku hûn ne ç’evnihêrî ne.45Awa k’î ye ew xulamê amin û serwaxt, ku axayê wî ew ser xulamên xwe k’ifþ kir, ku
xwarina wan waxtda bide wan? 46Xwezî li wî xulamî, ku gava axayê wî bê, wî usa bibîne. 47Ez rast dibêjime we, ewê wî
dayne ser t’emamya hebûka xwe.48Lê heger xulamê xirab dilê xweda bêje: „Axayê min hatina xwe derengî êxist” 49û dest
pê ke xulam-hevalên xwe xe û t’evî yên pey îçkê bixwe û vexwe, 50axayê wî xulamî wê rojeke usada bê, ku ewê ne hîvyê
be û siheteke usada, ku ewê nizanibe. 51Ewê wî xulêm qet-qetî ke û p’ara wî wê t’evî durûyan ke. Li wir wê bibe girî û
ç’irke-ç’irka diranan.

## 25

1Hingê P’adþatya ezmana wê mîna vê yekê be: Dehe qîzên bik’ir ç’irên xwe hildan pêþya zavêda çûn. 2Ji wan pênc
serwaxt bûn, lê pênc bêfem. 3Bêfeman ç’irên xwe hildan, lê rûn xwer’a hilnedan, 4lê yên serwaxt bi t’evî ç’irê rûn jî
derdananda xwer’a hildan.5Çaxê zava derengî k’et, hemû jî westyan û k’etine xewê. 6Nîvê þevê dengek hat: „Va ye zava tê!
Pêþya wîda her’in!”7Hingê hemû bik’ir rabûn ç’irên xwe saz kirin. 8Bêfeman gote serwaxtan: „Ji rûnê xwe bidine me jî,
çimkî ç’irên me vêdisin”. 9Lê serwaxtan li wan vegerand got: „Na, belkî ev rûn t’êra me û we neke. Baþ e, ku hûn her’ine
cem ewên ku difroþin xwer’a bik’ir’in”.10Û dema ew çûn bik’ir’in, zava hat û ewên hazir bi wîr’a k’etine dewatê û derî
hate girtinê. 11Paþê bik’irên din jî hatin û gotin: „Xudan, Xudan! Derî li me veke!” 12Lê wî caba wan da got: „Ez rast
dibêjime we, ez we nas nakim”. 13Awa hiþyar bimînin, çimkî hûn ne roja hatina Kur’ê Meriv dizanin, ne jî sihetê.14Hingê
P’adþatya ezmana wê mîna vê yekê be: Merivek wê derk’eta rêwîtyê, wî gazî xulamên xwe kirin, hebûka xwe sparte wan.
15Pênc telant dane yekî, dudu dane yê din û telantek jî da yekî din, her kesîr’a weke qewata wî û zû rê k’et çû. 16Yê pênc
telant standibûn, zû çû bi wan xebitî û pêncên din jî serda qazinc kirin.17Usa jî, yê ku du telant standibûn, duduyên din jî
qazinc kirin. 18Lê ewî ku telantek standibû, çû erd k’ola û zîvê axayê xwe têda veþart.19Pey gelek waxtr’a axayê wan
xulaman hat û xwast hesabê xwe t’evî wan bike. 20Yê ku pênc telant standibûn pêþda hat, pênc telantên din jî anîn û
got: „Axayê min, te pênc telant dabûne min. Min ser wanda pêncên din jî qazinc kirin,” 21Axayê wî gotê: „Eferim, xulamê
baþ û amin! Tu nava tiþtên hindikda amin mayî, ezê te daynime ser gelek tiþtan. Bik’eve þaya axayê xwe!”22Yê du telant
standibûn, ew jî hat û got: „Axayê min! Te du telant dabûne min. Min duduyên din jî li ser wanda qazinc kirin”. 23Axayê
wî gotê: „Eferim, xulamê baþ û amin! Tu nav tiþtên hindikda amin mayî, ezê te daynime ser gelek tiþtan. Bik’eve þaya
axayê xwe!”24Lê yê telantek standibû hat û got: „Axayê min, min zanibû, ku tu merivekî sert î. Ji wê dera te neçandye
didirûyî û ji dera te ne reþandye t’op dikî. 25Ez jî tirsyam, çûm min telantê te erdêda veþart. Hanê, ya te tera.”26Axayê wî lê
vegerand got: „Xulamê xirab û xweranedîtî! Te zanibû, ku ez ji wê dera ku min neçandye didirûm û ji wê dera ku min
nereþandye t’op dikim, 27çima te zîvê min neda serafan, ku ez bihatama min telantê xwe bi qazincêva bistanda?28Niha wî
telantî jê bistînin û bidine wî, deh telantên k’ê hene. 29Çimkî yê k’ê ku heye, wîr’a wê bê dayînê û serda wê zêde be, lê yê
k’ê ku t’une, çî wî jî heye wê jê bê standinê. 30Lê ew xulamê bêkêr bavêjine tarya derva. Li wir wê bibe girî û ç’irke-ç’irka
diranan.”31Dema ku Kur’ê Meriv bi rûmeta xweva t’evî hemû milyaketan bê, hingê wê li ser T’extp’adşê xweye rûmetê
rûnê 32her milet jî wê li ber hizûra wî bicivin. Ewê wan ji hev baþqe ke, çawa þivan pêz ji bizinan vediqetîne. 33Ewê pêz li
alyê xweyî rastê bide sekinandinê, lê bizinan li alyê ç’epê.34Hingê p’adþa wê yên li alyê xweyî rastêr’a bêje: „Werin,
dirozge lêbûyên Bavê min! Û wê p’adþatyê war bin, ya ku bona we ji dema efirandina dinyayêda hazir bûye. 35Çimkî ez
birçî bûm we xurek da min, t’î bûm we av da min, xerîb bûm, we ez qebûl kirim, 36tazî bûm, we ez k’inc kirim, nexaþ
bûm, hûn ser minda hatin, hebsêda bûm, hûn hatine dîtina min.”37Hingê yên rast wê wîr’a bêjin: „Xudan, me çiçax tu
birçî dîtî û xurek daye te? yan me tu t’î dîtî û av daye te? 38Me çiçax tu xerîb dîtî û tu qebûl kirî yan jî tu tazî dîtî û tu k’inc
kirî? 39Çiçax me tu nexaþ yan hebsêda dîtî û em hatine dîtina te?” 40P’adþa jî wê bêje wan: „Ez rast dibêjime we, heger we
qencî bona ji van birakî minî herî biç’ûk kir, we bona min kir”.41Hingê ewê yên alyê ç’epêr’a bêje: „Nifir lêbûyîno! Dûrî
min her’in: nava agirê heta-ha-tê, ku bona Þeytan û milyaketên wî hazir bûye. 42Çimkî ez birçî bûm, we xurek neda min,
t’î bûm, we av neda min, 43xerîb bûm, we ez qebûl nekirim, tazî bûm, we ez k’inc nekirim, nexaþ û hebsêda bûm, hûn ser
minda nehatin”.44Hingê ewê wîr’a bêjin: „Xudan! Me çiçax tu birçî yan t’î yan xerîb yan tazî yan nexaþ yan hebsêda dîtî û
me alîk’arî neda te”? 45Hingê ewê caba wan bide û bêje: „Ez rast dibêjime we, heger we qencî bona yekî ji evên herî biç’ûk
nekir, we bona min jî nekir”. 46Evê her’ine nava cizareta heta-ha-tê, lê yên rast wê her’ine nava jîyîna heta-ha-tê.»


generated on Thu Aug 7 16:57:02 2025

# 26

[1]Gava Îsa ev hemû xeber xilaz kirin, þagirtên xwer’a got: [2]«Hûn zanin, ku du rojan þûnda wê Cejina Derbazbûnê be û
Kur’ê Meriv xaçkirinêr’a wê bê dayînê.»[3]Hingê serokên k’ahînan û rûspyên cimetê li seraya serokk’ahînda, ku navê wî
Qeyafa bû, civyan [4]û li hev þêwrîn, ku Îsa dizîva bi fêlbazyê bigirin, bikujin. [5]Lê wan digot: «Bira ev yek cejinêda nebe, ku
cimet ranebe miqabilî me.»[6]Çaxê Îsa li Beytanyayê mala Þimhûnê k’otîda bû, [7]k’ulfetek, ku derdanek rûnê wêye bînxaþ
hebû û ew derdan ji alabastirê bû, ew hate cem Îsa û gava ew li ser sifrê rûniþtibû, rûn ser serê wîda kir. [8]Gava þagirtan
eva yeka dît, li wan xaþ nehat û gotinê: «Çima ev zyan bû? [9]Eva rûna dikaribû bi bahakî giran bihata firotanê û feqîranr’a
bihata belakirinê.»[10]Lê Îsa vê yekê hesya û gote wan: «Çima hûn xatirê wê k’ulfetê dik’evin? Ewê tiþtekî qenc bona min
kir. [11]Feqîr wê her t’im wer’a hebin, lê ezê her t’im ne t’evî we bim.[12]Ewê bona danîna mine li t’irbê ew rûn rête ser
bedena min. [13]Ez rast dibêjime we, dinyayêda li k’u eva Mizgînya bê dannasînkirinê, wê kirina vê k’ulfetê jî bona bîranîna
wê bê gotinê.»[14]Hingê yekî ji her donzdehan, ku Cihûdayê Îsxeryotî dihate gotinê, çû cem serokên k’ahînan [15]û got: «Hûnê
çi bidine min, ku ez wî bidime destê we?» Wana sî zîv wîr’a soz dan. [16]Ji wir þûnda ew mecalekê digerya, ku çawa Îsa bide
destê wan.[17]Li roja pêþin, ya Cejina Nanê Þkeva, þagirt hatine cem Îsa û wîr’a gotin: «Tu li k’u dixwazî Þîva Cejina
Derbazbûnê bixwî, ku em bona te hazir bikin?» [18]Ewî jî got: «Her’ine bajêr, cem filan merivî û bêjine wî: „Dersdar dibêje:
Roja min nêzîk e. Ezê Cejina Derbazbûnê þagirtên xweva t’evayî mala teda derbaz kim’’.» [19]Û þagirtan usa kir, çawa ku Îsa
ferman dabû wan û Þîva Cejina Derbazbûnê hazir kirin.[20]Êvarê ew t’evî her donzdehan ser sifrê rûniþt. [21]Gava wana hê
dixwar, Îsa got: «Ez rast dibêjime we, yekî ji nava we wê nemamya min bike.» [22]Þagirt gelekî ber xwe k’etin û ji wan her
kesî gotê: «Xudan, xa ne ez im?»[23]Ewî li wan vegerand got: «Ewê ku paryê xwe t’evî min t’asêda kir, ewê nemamya min
bike. [24]Hemî Kur’ê Meriv wê usa her’e, çawa ku bona wî hatye nivîsarê, lê wey li wî, k’î nemamya Kur’ê Meriv bike! Wîr’a
hê qenc bû, ku ew qet dinê nek’eta.» [25]Cihûdayê ku wê nemamya wî bikira, lê vegerand got: «Dersdar, xa ne ez im?» Îsa
wîr’a got: «Te bi zarê xwe got.»[26]Û hê wana nan dixwar, Îsa nan hilda þikirî da, ker kir da þagirtan û got: «Hanên, hildin
bixwin. Eva bedena min e.»[27]Peyr’a k’as hilda þikirî da û da wan got: «Hûn hemû jî ji vê vexwin, [28]eva xûna min e, bona
Peymana Nû, ku bona baxþandina gunehên gelekan tê rêtinê. [29]Lê ez dibêjime we, îdî ez ji vir hada ji berê vê mêwê
venaxwim, heta wê roja ku ezê t’evî we P’adþatya Bavê xweda ji ya nû vexwim.»[30]Paþê wan zebûrek stira, derk’etin çûne
ç’yayê Zeytûnê.
[31]Hingê Îsa gote wan: «Îþev hûn hemûyên jî ji min p’iþk bin her’in, çimkî nivîsar e: „Ezê þivên xim û pezê jî bela-belayî
bin’’. [32]Lê çaxê ez ji mirinê zêndî bim, ezê berî we her’ime Celîlê.»[33]Petrûs lê vegerand got: «Heger hemû jî ji te p’iþk bin
dûr k’evin, lê ez qet ji te naçim.» [34]Îsa gote wî: «Ez rast dibêjime te, hema îþev, hê berî bangdana dîk, tuê sê caran min
înk’ar kî.» [35]Petrûs gotê: «Heger dem bê, ezê bi ter’a bimirim jî, lê qet te înk’ar nakim.» Hemû þagirtan jî usa digotin.
[36]Hingê Îsa wanr’a t’evayî çû cîkî ku Gêtþemanî dihate gotinê û þagirtanr’a got: «Li vir rûnên, heta ez her’im dera han dua
bikim.» [37]Wî Petrûs û her du kur’ên Zebedî xwer’a hildan, k’esir hatê, ber xwe k’et. [38]Hingê gote wan: «Dilê min haqas derd
û k’eder e, mîna ber mirinê. Vir bimînin û t’evî min hiþyar bin.»[39]Hinekî pêþda çû deverû xwe avît, dua kir û got: «Bavo!
Heger dibe, bira ev k’as ji min derbaz be, lê ne ku xwastina min be, lê ya te be.»
[40]Paþê hate cem þagirtan, ew razayî dîtin û gote Petrûs: «Hûn nikaribû sihetekê t’evî min hiþyar bimana? [41]Hiþyar bimînin
û dua bikin, ku hûn nek’evine nava cêribandinê. Belê, ruh razî ye, lê beden sist e.»[42]Careke din Îsa dîsa çû dua kir û got:
«Bavo! Heger, heta ku ez vê k’asê venexwim, nabe ku ew ji min derbaz be, bira daxwaza te be.» [43]Û Îsa hat, ew dîsa
xewêda dîtin, ç’evên wan ji xewê venedibûn. [44]Û ew hiþtin çû, cara sisyan dua kir, dîsa ew xeber got.[45]Hingê hate cem
þagirtan û gote wan: «Hûn hela hê razayî ne û rihet dibin? Waxt pêr’a gihîþt, ku Kur’ê Meriv bik’eve destê gunehk’aran.
[46]Rabin em her’in. Va ye, ewê ku nemamya min dike nêzîk bû.»[47]Ewî hê xeber dida, Cihûdayê ku yek ji wan her
donzdehan bû hat. Wî ji alyê serokên k’ahînan û rûspyên cimetêda k’omeke giran xwer’a anîbû, bi daran û þûran.
[48]Nemamê wî eþaret dabû wan û gotibû: «Ez her’ime rûyê k’ê, ew e, wî bigirin.»[49]Hingê Cihûda nêzîkî Îsa bû û got: «Silav li
te, dersdar!» û çû rûyê wî. [50]Îsa gote wî: «Heval, tuê çima hatî?» Hingê ew pêþda hatin, dest avîtine Îsa û ew girtin.[51]Yekî ji
ewên ku t’evî Îsa bû, rabû þûrê xwe k’iþand li xulamê serokk’ahîn xist û guhê wî pekand. [52]Wê gavê Îsa gote wî: «Þûrê
xwe bike cî. K’î þûr hilde, ewê bi þûr her’e. [53]Te t’irê ez nikarim ji Bavê xwe bixwazim, ku hema niha ji donzdeh ordyan
zêdetir milyaketan bigihîne min? [54]Lê nivîsar wê çawa bêne sêrî, ku dibêjin, gerekê aha bin?»[55]Wê gavê Îsa gote wê k’oma
hatî: «Qey bêjî, hûn derk’etine ku yekî t’alank’ar bigirin, ku bi daran û þûran hatine min bigirin? Ê ne ez her roj t’evî we
p’aristxanêda rûdiniþtim û min hûn hîn dikirin, lê we ez nedigirtim. [56]Lê ev her tiþt bûn, ku nivîsarên pêxemberan bêne
sêrî.» Wê demê hemû þagirtan ew hiþt û revîn.[57]Lê yên ku Îsa girtin, ew birine cem Qeyafayê serokk’ahîn, li k’u qanûnzan
û rûspî civyabûn. [58]Petrûs jî ji dûrva heta hewþa serokk’ahîn, p’ê-p’ê pey wî hat, çû hindur û li nav xizmetk’aran rûniþt,
ku bizanibe axirî wê çawa be.[59]Serokên k’ahînan û t’emamya civîna giregiran jî þehdetîke derew miqabilî Îsa digeryan, ku
wî bikujin, [60]lê nedîtin. Gelek þehdên derew jî hatin, dîsa sedemek nedîtin. Paþê du þehdên derew pêþda hatin [61]û gotin:
«Evî got: „Ez p’aristxana Xwedê dikarim hilþînim û nava sê rojanda wê dîsa çê kim.’’»[62]Serokk’ahîn rabû ser p’yan û gote
wî: «Bona van þehdetyên ku evana miqabilî te didin tu çima cabekê nadî?» [63]Lê Îsa dengê xwe nekir. Serokk’ahîn dîsa
gote wî: «Ez te bi Xwedêyê zêndî didime sondê. Mer’a bêje, tu yî Mesîh, Kur’ê Xwedê?» [64]Îsa gotê: «Te bi zarê xwe got. Lê ez
dibêjime we, hûnê ji vir hada Kur’ê Meriv li cem Yê Zor, li alyê wîyî rastê rûniþtî û li ser e’wrên ezmênva tê
bibînin.»[65]Hingê serokk’ahîn k’incên xwe qelaþtin û got: «Evî k’ifirî kir! Îdî þehde çî mer’a ne? Va ye we niha k’ifiryê wî
bihîst? [66]Weva çawa k’ifþ dibe?» Wana jî lê vegerand got: «Wî dik’eve, ku bê kuþtinê.»[67]Hingê t’ûyî rûyê wî kirin û bi
k’ulman lêdan, hinekan jî þemaq lê didan [68]û digotinê: «Mesîh, mer’a pêxembertyê bike, k’a k’î bû, ku te xist?»[69]Hingê

Petrûs derva li hewþêda rûniþtibû. Carîk hate cem wî û got: «Tu jî t’evî Îsayê Celîlê bûyî.» 70Lê ewî li ber hemûyan înk’ar
kir got: «Ez nizanim tu çi dibêjî.»71Û gava ew çû ber derge, yeke din ew dît û gote yên li wir hizûr: «Evî han jî t’evî Îsayê
Nisretê bû.» 72Wî dîsa bi sond înk’ar kir got: «Ez wî merivî nas nakim.»73Demekê þûnda ji merivên wir çûne cem Petrûs û
gotinê: «Bi rastî jî tu ji wan î, çimkî zaravê te jî te difiroþe.» 74Hingê wî da nifiran, sond xwar got: «Ez wî merivî nas
nakim.» Hema wê gavê dîk bang da 75û Petrûs ew gotina Îsa bîr anî, ku gotibûyê: «Berî bangdana dîk, tuê sê caran min
înk’ar kî.» Ew derk’ete derva û k’ele-k’el girya.

## 27

1Çaxê sibeh ron bû, t’evaya serokên k’ahînan û rûspyên cimetê li hev þêwrîn, ku Îsa çawa bidine kuþtinê. 2Ew girêdan,
birin dane destê Pîlatoyê welî.3Hingê Cihûdayê ku nemamya wî kir, dît ku Îsa hate bendkirinê, p’oþman bû, çû ew sî zîv
vegerande serokên k’ahînan û rûspyan 4û got: «Min guneh kir. Ez bûme bayîsê xûna bêsûc.» Wan jî gotê: «Mer’a çi, tu
zanî.» 5Wî jî ew zîv avîtine nav p’aristxanê, derk’et çû (qet avîte stukura xwe) û xwe dardakir.6Lê serokên k’ahînan zîv
hildan û gotin: «Ne rast e, ku em van t’evî xezna p’aristxanê kin, çimkî ew maþê xûnê ye.» 7Hingê ew li hev þêwrîn û bi
wan zîvan erdê Axînker k’ir’în, bona gor’ên xerîban. 8Lema ew erd heta îro jî «Erdê Xûnê» tê gotinê.9Hingê ew gotina bi
zarê Yêremya pêxember hate sêrî: «Sî zîv bahê wê dan, weke wî bahê ku lawên Îsraêlê qayl bûn 10û ew dane erdê Axînker,
çawa Xudan ferman da min.»11Îsa ber welî sekinî, ewî jê pirsî: «Tu yî p’adþayê cihûyan?» Îsa got: «Te bi zarê xwe got.» 12Lê
gava serokên k’ahînan û rûspyan ew gunehk’ar dikirin, wî qet caba t’u kesî neda. 13Hingê Pîlato gote wî: «Tu nabihêyî
çiqas þikyatê te dikin?» 14Wî dîsa caba t’u kesî neda, heta ku welî jî þaþ ma.15Xeysetê welî bû, ku cejinêda bi xwastina
cimetê girtîkî ji hebsê wanr’a berda. 16Hingê girtîkî k’ifþ hebû hebsêda, navê wî Barabas.17Gava ew civyan, Pîlato wanr’a
got: «Hûn k’îjanî dixwazin ez bona we ber’dim: Barabas yan Îsayê ku Mesîh tê gotinê?» 18Ewî zanibû, ku ji hevsûdyê Îsa
dabûne destê wî.
19Çaxê ew li herema dîwanê rûniþtibû, jina wî cab serda þand got: «K’arê te ewî bêsûc nek’etye, çimkî îþev xewnêda bona
wî gelek tiþt hatine serê min.»20Lê serokên k’ahînan û rûspyan cimetê razî kir, ku Barabas bixwazin û Îsa unda bikin.
21Welî dîsa gote wan: «Hûn ji van her duyan k’îjanî dixwazin, ku ez wer’a ber’dim?» Wan jî lê vegerand: «Barabas!»
22Pîlato gote wan: «Lê Îsayê ku wîr’a Mesîh dibêjin çawa bikim?» Hemûyan jî got: «Bira bê xaçkirinê!»23Welî got: «Evî çi
xirabî kirye?» Hingê wana dengê xwe hê bilind kirin û gotin: «Bira bê xaçkirinê!» 24Pîlato jî dît, ku t’u tiþt alîk’aryê nade,
lê hê þer’-de’w dest pê dibe, av hilda li ber hizûra cimetê destên xwe þûþtin û got: «Ez ji xûna vî bêsûc im. Hûn xwexa
binihêrin.»25Û t’emamya cimetê caba wî da got: «Bira xûna wî li ser me û lawên me be!» 26Hingê Pîlato Barabas wanr’a
berda, lê Îsa da ber qamçyan û da destê wan, ku bê xaçkirinê.27Hingê eskerên welî Îsa birine hindurê rewþxana welî û
t’emamya refa eskeran ser wî civya. 28K’inc jê þiqitaqndin û çuxekî sorê-gevez lê kirin. 29Paþê t’acgulîk ji stiryan vegirtin
dane sêrî û qamîþek jî dane destê wîyî rastê. Hingê li ber wî çok dan, qerfê xwe wî kirin û gotin: «Xaþ be, p’adþayê
Cihûyan!»30T’ûyî wî kirin, qamîþ hildan sêrî xistin. 31Pey qerfkirinêr’a çuxê sor jê êxistin û k’incên wî lê kirin û ew dane
pêþya xwe birin, ku xaç bikin.32Gava ew derk’etine derva, eskeran yekî ji Kûrênê dît, navê wî Þimhûn, p’êyî ser kirin, ku
xaçê Îsa hilde. 33Ew gihîþtine wê dera ku wêr’a Golgota digotin, ku tê femkirinê: «Cyê Qafê miryan.» 34Þerab, zirav t’evkirî,
danê ku vexwe. Lê gava wî te’m kir, nexwast vexwe.35Ew xaç kirin, ser k’incên wî p’eþk avîtin û li nava hevda bela kirin.
36Paþê li wir rûniþtin, nobedarî wî kirin. 37Neheqya wî nivîsîn danîn fêza serê wî: «Ev Îsa, p’adþayê Cihûyan e.»38Hingê du
t’alank’ar jî wîr’a hatine xaçkirinê, yek li alyê rastê û yê din jî li alyê ç’epê. 39Û Ewên ku wirr’a derbaz dibûn ew bêhurmet
dikirin, serê xwe dihejandin 40û digotinê: «Ne teyê p’aristxane hilþanda û sê rojanda çê kira? De xwe rizgar ke, heger tu
Kur’ê Xwedê yî! Ji xaç were xwarê!»41Usa jî serokên k’ahînan, qanûnzanan û rûspyan t’evayî qerfê xwe wî dikirin û
digotin: 42«Xelq rizgar kir, lê nikare xwe rizgar bike! Gelo ev ne p’adþayê Îsraêlê ye? De bira niha ji xaç bê xwarê û emê
bawerya xwe wî bînin.43Gumana xwe danî ser Xwedê, de bira niha wî rizgar bike, heger Xwedê jê razî ye, çimkî digot: „Ez
Kur’ê Xwedê me”.» 44T’alank’arên bi wîr’a hatine xaçkirinê jî usa ew bêhurmet dikirin.45Nîvro, ji siheta donzdehan heta
siheta sisyan t’emamya erdê bû tarî. 46Nêzîkî siheta sisyan Îsa bi dengekî bilind kire qîr’în û got: «Êlî, Êlî, lama sabaxtanî?»
Ku tê femkirinê: «Xwedê min, Xwedê min, te çima ez berdam?» 47Ewên nêzîk sekinî, gava ev xeber bihîstin, gotin: «Ew
gazî Êlyas dike.»48Yekî ji wan lez bezî, kevz hilda sirkêda kir, qamîþek pêva danî û da wî, ku vexwe. 49Lê hinekên din gotin:
«Bisekine. Em binihêrin, k’a Êlyasê bê wî rizgar ke?»
50Îsa dîsa bi dengekî bilind kire gazî û ruhê xwe da.51Hingê p’erda p’aristxanê ji serî heta binî qeliþî, bû du p'arî. Erd hejya,
kevir qeliþîn, 52t’irb vebûn û gelek qalibên miryên buhurtî zêndî bûn. 53Ew ji t’irban, pey zêndîbûna Îsar’a derk’etin û
çûne Bajarê pîroz û gelekan ew dîtin.54Û gava sersed û yên pêr’a, ku nobedarî Îsa dikirin, erdhej û her tiþtên bûyî dîtin,
saw û tirsê ew girtin û gotin: «Rastî jî ev Kur’ê Xwedê bû!»
55Li wir gelek k’ulfet jî hebûn, ku ji dûrva dinihêrîn. Ew ji Celîlê bona xizmetkirinê li pey Îsa hatibûn: 56Meryema
Mejdelanî, Meryema dya Aqûb û Ûsiv û dya her du kur’ên Zebedî jî li nava wanda bû.57Berî êvarê merivekî dewlemendî ji
Arîmetyayê, navê wî Ûsiv, hat. Ew jî yek ji þagirtên Îsa bû. 58Ew çû cem Pîlato û cinyazê Îsa ji wî xwast. Wê gavê Pîlato
ferman da, ku cinyaz bê dayînê.59Ûsiv cinyaz hilda, qedekê k’itanîyî paqijda k’efen kir 60û li t’irba nûda danî, ku bona xwe
qeyakêda k’olabû. Paþê ewî kevirekî mezin holî ber derê t’irbê kir û çû. 61Meryema Mejdelanî û Meryema din li wê derê
bûn û pêþberî t’irbê rûniþtibûn.62Roja din, ku pey înyêr’a ye, serokên k’ahînan û fêrisyan civyane cem Pîlato, 63gotin: «Em
xulam, bîra meda ye, ku ewî derewîn çaxê hê zêndî bû digot: „Ezê roja sisyan ji mirinê zêndî bim”. 64Niha fermanê bide,
ku heta roja sisyan miqatî t’irbê bin, nebe ku þagirtên wî bên wî bidizin û cimetêr’a bêjin: „Ew ji mirinê zêndî bûye”. Û


generated on Thu Aug 7 16:57:02 2025

xalifandina paþin ji ya pêþin xirabtir be.»[65]Pîlato wanr’a got: «Va ne, wer’a eskerên nobedar. Her’in, çawa hûn zanin usa
miqatyê t’irbê bikin.» [66]Ew jî çûn miqatî t’irbê kirin: kevir mor kirin û eskerên nobedar li ber danîn.

## 28

[1]Pey þemyêr’a: roja yekþemê, sibehê zû Meryema Mejdelanî û Meryema din hatin, ku t’irbê bibînin. [2]Niþkêva erd qayîm
hejya, çimkî milyaketekî Xudan ji ezmên hate xwarê, kevir ji ber t’irbê wêda kir û ser rûniþt.[3]Dîndara wî mîna birûskê
bû, k’incên wî jî mîna berfê sipî bûn. [4]Nobedar ji tirsa wî t’evîhev bûn û bûne mîna miryan.[5]Milyaket gote wan k’ulfetan:
«Netirsin! Ez zanim, ku hûn Îsayê ku hate xaçkirinê digerin. [6]Ew ne vir e, çimkî ji mirinê zêndî bûye, çawa ku wî gotibû.
Werin wî cyê ku ew lê hate danînê binihêrin. [7]Zû her’in þagirtên wîr’a bêjin: „Ew ji mirinê zêndî bûye û ewê berî we
her’e Celîlê. Li wir hûnê wî bibînin”. Va ye min wer’a got.»[8]Ewana bi saw û þabûneke mezin lez ji t’irbê derk’etin û
lezandin, ku þagirtanr’a bêjin. [9]Niþkêva Îsa rastî wan hat û got: «Silav li we!» Ew nêzîkî wî bûn, xwe avîtine nigên wî,
girtin û ew hebandin. [10]Hingê Îsa gote wan: «Netirsin! Her’in birayên minr’a bêjin, ku ew her’ine Celîlê û li wir wê min
bibînin.»[11]Gava k’ulfet çûn, ji nobedaran hinek hatine bajêr û tiþtên ku bibûn serokên k’ahînanr’a gotin. [12]Serokên
k’ahînan t’evî rûspyan civyan û þêwrîn. Paþê wan gelek p’ere dane nobedaran [13]û gotin: «Bêjin: „Çaxê em xewêda bûn,
þagirtên wî hatin ew dizîn”.[14]Û heger ev yek bigihîje ber guhê welî, emê ziman wîr’a bibînin û we bêxem bihêlin.» [15]Wan
jî p’ere hildan û usa kirin, çawa ku hatibûne hînkirinê. Û ev gotin li nava cihûyanda heta roja îroyîn bela bûye.[16]Her
yanzdeh þagirt jî çûne Celîlê, wî ç’yayê ku Îsa wanr’a gotibû. [17]Gava ew dîtin, ew hebandin, lê hinek dudilî bûn.[18]Îsa nêzîkî
wan bû, wanr’a xeber da got: «Hemû hikum minr’a hate dayînê: li ezmên û li ser erdê. [19]Niha her’in her miletan bikine
þagirt û bi navê Bav, Kur’ û Ruhê Pîroz wan binixêmin[20]û hemû t’emyên ku min dane we miletan hîn bikin, ku ew wan
xwey bikin. Awa, ji îroda girtî, heta axirya dinyayê ez t’evî we me!»


generated on Thu Aug 7 16:57:02 2025